

PAPER DETAILS

TITLE: Pseudonym in Classical Kurdish Literature

AUTHORS: Abdurrahman ADAK

PAGES: 11-58

ORIGINAL PDF URL: <https://dergipark.org.tr/tr/download/article-file/678044>

Mexles di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de

Pseudonym in Classical Kurdish Literature

Abdurrahman Adak*

PUXTE:

Mexles, navê edebî ye ku di edebiyata klasîk a Îslamî de (edebiyatên Farisî, Tirkî, Kurdî û hwd.) ji aliyê helbestvanan ve di metnên edebî de hatiye bikaranîn. Bikaranîna mexlesê, di edebiyata Farisî de di sedsala XIIIem de û di edebiyatên Tirkî û Kurdî de jî di sedsala XVem de binech bûye. Di edebiyata Kurdî ya klasîk de tradîsyona bikaranîna mexlesê heta bi roja me dewam kiriye. Di gotarê de pêşî li ser mahiyeta mexlesê û tarîxa wê hatiye rawestan. Piştre jî listeyeke nimûneyî ji bo mexlesên edebiyata Kurdî hatiye dayîn û di çarçoveya vê lîsteyê de hin taybetiyêñ mexlesên Kurdî hatine tesbîtkirin ku ew jî ev in: Şeweyên bikaranîna mexlesê, mexles ji aliyê morfolojîk ve, pêwendîya mexlesê bi kêşê re, orjîna mexlesan, mexles ji aliyê wateyê ve, pirmexlesî û hevpariya mexlesan.

Peyvîn Sereke: mexles, tradîsyona mexlesê, pirmexlesî, hevpariya mexlesan.

ABSTRACT:

Pseudonym is a literary name used in the writings of the poets of classical Islamic literature (Persian, Turkish, Kurdish, etc.). Using pseudonyms were situated in the Persian literature in the XIII. century and later in the Turkish and Kurdish literature in the XV. century. The classical Kurdish literature have continued to use the tradition of using pseudonyms to present day. In the article, firstly the prominence and history of the pseudonym have been given. Thereafter, a list of examples of pseudonyms from Kurdish literature was given and some of the features of the Kurdish pseudonyms have been found in this list. These are the ways of using pseudonym;

* Doç. Dr., Zanîngeha Mardin Artukluyê, Fakulteya Edebiyatê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, Mêrdin, Turkiye. / Assoc. Prof. Mardin Artuklu University Faculty of Literature,
Departmant of Kurdish Language and Literature, Mardin, Turkey.
e-mail: abdurrahmanadak@gmail.com

pseudonyms in terms of morphology; relations of pseudonym with rhyme; the origin of pseudonym; pseudonyms in terms of meaning; having multi-pseudonyms; common pseudonyms.

Key Words: pseudonym, pseudonym tradition, multi-pseudonyms, common pseudonym.

1. DESTPÊK

Mexles, bi kurtî, navê edebî ye ku di edebiyata klasîk a Îslamî (edebiyatê 'Erebî, Farisî, Tirkî, Kurdî û yên dî) de ji aliyê helbestvan û naziman ve di helbest û menzûmeyan de hatiye bikaranîn. Bikaranîna mexlesê tradîsyoneke bingehîn û cudaker a edebiyata klasîk a Îslamî ye ku edebiyata Kurdî ya klasîk jî beşek jê ye. Bêguman mexlesên ku di edebiyata Kurdî ya klasîk de hatine bikaranîn ji aliyê seyra tarîxî, diyalektêne Kurdî û şêweyên bikaranînê ve hin xweseriyên xwe jî hene. Ji aliyekî dî ve mexles, ji bo di edebiyata Kurdî ya klasîk wek hêmaneke bingehîn a estetîk, poetîk û retorîka metnê edebî jî derdikeve pêş. Ev mijara girîng ku yek ji tradîsyonên bingehîn a edebiyata Kurdî ya klasîk e, heta niha ji putepêdaneke taybet bêpar maye. Bi awayekî siruştî nebûna derfetan rê nedaye ku li Bakur li ser vê mijarê xebat bêن kirin. Li Başûr û deverên dî jî bi qasî ku em dizanin, di vê biwarê de pir kêm lêkolîn hatine kirin. Herçiqas 'Ezîz B. E. & 'Ebdulla M. E. (2018), bi sernavê "Naznaw le Şî'rî Klasîkî Kurdî da" rasterast li ser mijara mexlesê gotarek nivîsîne jî, di gotarê de li ser hokarêne bikaranîna mexlesê hatiye rawestan û di biwara tesbîtkirina mexlesên Kurdî û taybetiyên wan de xebateke tewsîfî û analîtîk nehatiye kirin.

Guman tuneye ku di biwara mexlesên edebiyata Kurdî ya klasîk de gelek pirs hene ku li hêviya bersivêن xwe ne. Gelo bikaranîna mexlesê di edebiyata Kurdî ya klasîk de ci wexfi dest pê kiriye? Gelo ev bikaranîn bi qasî ku bibe tradîsyonek ji aliyê gelek helbestvanan ve hatiye şopandin? Gelo di vê biwarê de di navbera diyalektêne Kurdî de cudahiyêن bi ci rengî hene? Gelo di teşeyêne nezmê yên edebiyata Kurdî ya klasîk de ci şêweyên bikaranîna mexlesê hene? Gelo morfolojiya mexlesên Kurdî bi ci rengî ye? Gelo helbestvanê Kurd ên klasîk herî zêde di kîjan mijaran de mexles hilbijartine? Gelo di edebiyata Kurdî ya klasîk de diyardeyêن pirmexlesiyê û hevpariya mexlesan têن dîtin? Armanca vê gotarê ew e ku di çarço-veya pirsên weha de mexlesên ku di edebiyata Kurdî ya klasîk de hatine bikaranîn û taybetiyên wan ên bingehîn bêن tesbîtkirin û di vî warî de gaveke destpêkî bê avêtin. Bêguman hemû mijarênav borî yên têkildarî mexlesê girîng in, lêbelê em dikarin bibêjin ku hin ji wan gelekî girîng in. Bo nimûne mijara hevpariya mexlesan, ji ber ku di tesbîtkirina xwedîyê rasteqîn ê helbestê de dibe sebebê tevliheviyan di nav wan de wek mijareke gelekî girîng derdikeve pêş. Bêguman amadeki-

rîna lîsteyeke giştî ya mexlesên edebiyata Kurdî ya klasîk û tesbîtkirina şêweyên bikaranîna mexlesê jî armancêne sereke yên gotarê ne.

Gotar, ji bilî besê destpêkê û çavkaniyan ji sê bes û encamekê pêk tê. Piştî ku di beşa duyem a gotarê de, wek têgeheke edebiyata Îslamî bi giştî li ser pênase, mahiyet û tarîxa bikaranîna mexlesê hat rawestan, di besê peyrew de bi hûrgulî taybetiyêñ mexlesên edebiyata Kurdî ya klasîk dê bêñ pêşkêşkirin. Di vê çarçoveyê de di beşa sêyem de mexlesên ku di edebiyata Kurdî ya klasîk de hatine bikaranîn hem li gor dîyalektên Kurdî, hem jî bi awayekî alfabetik dê bêñ rêzkin. Piştre di beşa çarem de di çarçoveya mexlesên ku hatine tesbîtkirin de, li ser taybetiyêñ curbicur ên mexlesên edebiyata Kurdî ya klasîk dê bê rawestan ku li jorê di çarçoveya armancêne gotarê de amaje bi wan hat kirin. Herî dawî bi encamekê dê dawî li gotarê bê dayîn.

Em hêvî dikin ku bi saya vê gotarê, di mijara mexlesên edebiyata Kurdî ya klasîk de bingehek bê avêtin ku rê li ber gelek xebatêñ dî jî veke.

2. MEXLES BI AWAYEKÎ GIŞTÎ

Di tradîsyona edebiyata klasîk a Îslamî de (edebiyatêñ ‘Erebî, Farisî, Tirkî Kurdî û hwd) helbestvan û naziman di helbest û menzûmeyêñ xwe de bi piranî ji bilî navêñ xwe yên rasteqîn navekî cuda û taybet wek navêñ xwe yên edebî bi kar anîne û di cîhana edebiyatê de bi wî navî hatine naskirin. Herçiqas ev tradîsyoneke bingehîn a edebiyata Îslamî ye jî, di seyra tarîxî ya vê tradîsyonê de, di nav edebiyatêñ Îslamî de termînolojî û pratîkîn cuda têñ dîtin. Di helbesta ‘Erebî de ji serdema Cahiliyeyê (sedsala VIlem) heta bi sedsala XIIIlem, di qesîdeyan de helbestvanan cih dane leqebêñ xwe, lêbelê ev wek texellusa (mexles) ku piştre di edebiyata Farisî de dê derkeve meydanê nebûye dustûreke bingehîn a helbestê. Lewra helbestvanêñ ‘Ereb ne di hemû qesîdeyêñ xwe de, di hinan de û ne li cihekî taybet a qesîdeyê, li cihêñ ku xwestine serî li vê şêwazê dane (Xudayar, 1391, r. 68). Dema mirov li qesîdeyêñ herî kevin ên edebiyata Erebî, yanî li mu’elleqeyan dinêre (Cum’e, 2003), ev yek bi awayekî aşkera tê dîtin. Ji ber ku di helbesta ‘Erebî ya vê qonaxê de ev bikaranîn tam rûneniştîye, teorîze jî nebûye û jî bo wê têgeheke edebî nehatiye danîn.

Di edebiyata Farisî de helbestvanan girîngiyeke taybet bi navê edebî nîşan dane. Dikare bê gotin ku hemû helbestvanan ji bo ku di helbesten xwe de bi kar bînin, navekî edebî hilbijartine û ev nav bi taybetî di dawiya helbestê de bi kar anîne. Ev şêwaz cara pêşî di sedsala Xem de bi destê Rûdekî (k.d.941) ketiye nav edebiyata Farisî û di sedsala XIIIlem de wek tradîsyoneke edebî bi tevahî belav bûye. (Xudayar, 1391, r. 63). Jixwe em dizanin ku di edebiyata Farisî ya sedsala navborî de xezel, bi destê sûfiyan ji qesîdeyê veqetiyaye û di helbestê de qonaxa

sebkê Iraqî dest pê kiriye. Berî vê qonaxê di nav helbesta sebkê Xorasanî de xezel beşek ji quesîdeyê ye û ne serbixwe ye (Fesaî, 1373, r. 564, 579-594; İpekten, 1996, b. III, r. 440-442). Ev jî nîşan dide ku bikaranîna navê edebî di çarçoveya sebkê Iraqî de di teşeya xezelê de belav bûye.

Ji ber ku di edebiyata Farisî de cihê navê edebî dawiya helbestê ye, bi wateya derketina ji helbestê û xilaskirina wê, ji vî navî re “texellus” hatiye gotin. Li aliyekî dî divê bê gotin ku di edebiyata ‘Erebî de jî têgeha “texellus”ê heye, lêbelê ne bi wateya navborî, bi wateya beyta ku helbestvan bi rîya wê ji beşa nesîbê derbasî beşa medhiyeyê ya quesîdeyê dibe tê bikaranîn. Texellus bi vê wateyê derbasî edebiyata Farisî jî bûye. Lêbelê, çawa ku hat gotin, di sedsala XIIIem de wateya navê edebî jî lê hatiye barkirin û bi vî awayî di edebiyata Farisî de du wateyên wê çêbûne (Xudayar, 1391, r. 63-64).

Piştî ku tradîsyona texellusê bi wateya xwe ya duyem (navê edebî) di edebiyata Farisî de rûniştiye, ji wê edebiyatê derbasî edebiyatê dî yên İslâmî jî bûye. Îdî hin helbestvanen ‘Ereb jî di bin bandora edebiyata Farisî de di dawiya helbesten xwe de dest bi bikaranîna navên xwe yên edebî kirine (Xudayar, 1391, r. 68). Texellus cara pêşî di sedsala XVem de bi destê Şeyxî (k.d.1431) ketiye nav edebiyata Tirkî (Yardım, 2006, r. 12). Çawa ku emê li jérê di beşeke serbixwe de li ser rawestin, destpêka bikaranîna texellusê di edebiyata Kurdî de sedsala XIem e, lêbelê belavbûna wê sedsala XVem e.

Li vê derê xaleke girîng ku divê em li ser rawestin ew e ku di edebiyatê İslâmî de ji bo navê edebî du têgeh hatine bikaranîn: Texellus û mexles. Çawa ku li jorê hat gotin, ev bikaranîn di edebiyata Farisî de ji sedsala XIIIem ve bi “texellus”ê tê ifadekirin. Di edebiyata Tirkî de jî li şûna wê têgeha “mexles” hatiye bikaranîn. (Yardım, 2006). Helbestvanen Tirk şêweya bikaranînê ji edebiyata Farisî wergirtibin jî, navê wê ji edebiyata ‘Erebî wergirtine. Lewra em dibînin ku di hin çavkaniyên ‘Erebî de li şûna “texellus”ê “mexles” hatiye bikaranîn (Xudayar, 1391, r. 68).

Eger em ji aliyê etîmolojîk/morfolojîk ve li têgehê texellus û mexlesê binêrin, emê bibînin ku her du jî di zimanê ‘Erebî de ji heman raderî hatine dariştin (x-l-s) ku wateya wê ya ferhengî rizgarbûn, derketina ji tiştekî û xilaskirina tiştekî ye. Ji ber vê jî di quesîdeyê de ji bo derketina ji beşa nesîbê û destpêkirina beşa medhê texellus hatiye gotin (wateya yekem a texellusê). Bi heman mentiqê navê edebî yê ku di dawiya helbestê de, yan jî di derketina wê de hatiye bikaranîn jî bi heman navî hatiye binavkirin. Bi gotineke zelal ji ber ku ev navê edebî di dawiya metnê edebî de cih digire jê re texellus hatiye gotin. Herçiqas texellus û mexles ji heman raderî hatine dariştin jî, formen wan cuda ne. Mexles, di zimanê ‘Erebî de di forma “ismê mekan”ê de ye û tê wateya cihê xilasbûna tiştekî. Lêbelê texellus bi wateya ‘mexlesgirtin’, yan jî ‘bikaranîna mexlesê ji aliyê nazim/helbestvan ve’

di forma mesderê de ye. Bi baweriya me, ji ber ku mexles di morfolojya Erebî de “ismu mekan” e dibe navdêr (ism) û ji ber vê jî bikaranîna wê wek navê tiştekî ji bikaranîna texellusa ku wateya mesderê dide guncawtir e. Li gor vê nêrînê navê edebî yê ku helbestvan bi kar tîne dibe “mexles”, bikaranîn û hilbijartina wî navî jî dibe “texellus”.

Çawa ku hat gotin mexles taybetiyeke edebiyatêن Îslamî ye. Lêbelê carinan mexlesa Rojhilatî û “navê muste’ar”, ku jêdera wê çanda Rojavayê ye, tên tevli-hevkirin û her du li şûna hev tên bikaranîn. “Navê muste’ar” di sedsala XIXem de di serdema dewleta Osmanî de li şûna “pseudonym”a Rojavayî hatiye bikaranîn. Di Tirkiya îro de li şûna “navê muste’ar”, “takma ad” jî tê bikaranîn ku tê wateya navê ku nivîskarekî piştre li xwe kiriye. Hem mexles, hem jî navê muste’ar navê duyem in û piştre tên stendin. Ji vî aliyî ve her du wek hev in. Lêbelê di navbera wan de cudahiyeke bingehîn heye. Di bikaranîna navê muste’ar de faktora sereke daxwaza xweveşartinê ye. Nivîskarên ku ji ber sedemên curbicur naxwazin navên xwe yên eslî bi kar bînin navê muste’ar bi kar tînin û bi vî awayî xwe vedîşerin. Lêbelê di mexlesê de bi tu awayî xweveşartin tuneye. Berevajiyê wê mexles navek e ku di çarçoveya tradîsyoneke edebî de tê bikaranîn û helbestvan bi wî navî tê naskirin.(Okay, 2006, r. 130). Hetta gelek caran navê helbestvan ê eslî tê jibîrkirin (wek Nalî û Siyahpoş) û helbestvan tenê bi mexlesa xwe tê naskirin. Di ferhenga Redhouse de mexles wek şêweyeke surname/paşnavê hatiye pênamekirin (Redhouse, 1880, r. 1780). Bi rastî jî di navbera erka mexlesê û erka paşnavên îroyîn de pêwendîyeke xurt dikare bê dîtin. Lewra her du jî hêmaneke nasnameyê ne û li kêleka navê rasteqîn tên bikaranîn. Heçî navê muste’ar e, ew rasterast li şûna navê eslî tê bikaranîn. Cudahiyeke dî ya mexlesê û navê muste’ar ew e ku mexles bi piranî di metnên edebî yên menzûm de, lêbelê navê muste’ar di berhemên pexşan de hatiye bikaranîn (Yardım, 2006, r. 17).

Di roja me de di hin çavkaniyêن Kurdî de ji bo mexlesê peyva “nasnav”ê tê bikaranîn (Xeznedar, b. 1, r. 170) ku bi baweriya me ev ne bikaranîneke di cih de ye. Lewra nasnav tê wateya navê ku mirov pê tê naskirin. Di navbera vê wateya nasnavê û wateyên mexles û texellusê yên derbasbûyî de pêwendîyeke etîmolojîk tuneye. Xuya ye ku di nasnava Kurdî de mentiqa navê muste’ar heye. Ji ber vê jî em pêşniyaz dikin ku nasnav her di vê çarçoveyê de, yanî bi wateya navê muste’ar bê bikaranîn û mexles wek xwe bimîne. Çawa ku di Tirkî de jî ji bo navê muste’ar “takma ad” tê bikaranîn, di Kurdî de jî ji bo navê muste’ar “nasnav” dikare bê bikaranîn. Lêbelê heçî mexles e, ew têgeheke taybet a tradîsyoneke edebî ye.

Di edebiyatêن Îslamî de mexlesên ku hatine bikaranîn bi piranî ji aliyê helbestvanan ve hatine hilbijartın. Lêbelê carinan hin mexles ji aliyê ustadên helbestê ve hatine hilbijartın û li helbestvanen ciwan hatine kirin. Dayîna mexlesê ji aliyê

ustadekî/hostayekî ve bi taybetî di edebiyata Osmanî de gelekî berbelav e. Di edebiyata Osmanî de van ustadan dema mexlesek dane helbestvanekî, helbestek jî nivîsîne û di vê helbestê de pesnê helbestvanê ciwan dane û mexlesa wî aşkera kirine. Di edebiyata Osmanî de helbestên bi vî rengî wek "mexlesname" hatine binavkirin (Yardım, 2006).

Di çarçoveya çavkaniyan de (Şerîfî, 1391, r. 397; Akün, 1994, b. 9, r. 394-396; Kurnaz & Çeltik, 2013, r. 90-91) hin taybetiyên dî yên mexlesê weha dikarin bêrêzkin: Bi saya bikaranîna mexlesê xwediyyê metnê edebî aşkera dibe û di aîdiyeta metnê edebî de tu arîse dernakeve. Ji vî aliyî ve dikare bê gotin ku mexles, navê edebî yê edebiyatvan e ku nahêle berhemên wî bi berhemên edebiyatvanê dî re tevlihev bibin. Loma di edebiyata klasîk de mexles roleke girîng dilîze. Mexles, ji aliyekî ve jî rola îmzeya edebî dibîne ku ji aliyê edebiyatvan ve di berhema wî ya edebî de tê bikaranîn.

Tradîsyona bikaranîna mexlesê gelekî bi hêz e. Loma mexles ji aliyê piraniya helbestvanan ve hatiye bikaranîn. Lêbelê divê bê zanîn ku di edebiyata klasîk de helbestvanê ku mexles bi kar neanîne jî têr dîtin. Ci menzûmeyen serbixwe ên dirêj bin û ci helbestên dîwanan bin, standarta cihê mexlesê dawiya metnên edebî ye. Çawa ku mexles girîng e, cihê ku tê de derbas dibe jî girîng e, loma ew cih navên taybet werdigirin. Beyt, yan jî benda ku mexles tê de cih digire wek "beyta mexlesê" û "benda mexlesê" têr binavkirin. Şûna van têgehan, têgehê "beyta texellusê" û "benda texellusê" û şûna van hemûyan jî têgeha "mexlesxane" yê jî hatine bikaranîn. Di quesîdeyê de beyta ku "mexles" a helbestvan tê de cih digire wek "beyta tac" jî hatiye binavkirin. Di hin helbestan de di hemû beytan de mexles hatine bikaranîn. Di vê rewşê de hemû beyt dibin mexlesxane.

Çawa ku hat gotin mexles hem di helbestên wek xezel, quesîde û musemmetan de hem jî di menzûmeyen serbixwe de tê bikaranîn. Lêbelê di teşeyên kurt ên wek rubâî, dubeytî û ferdan de mexles nayê bikaranîn, yan jî pir kêm tê bikaranîn. Loma dikare bê gotin ku mexles taybetiyeke helbestên navîn û dirêj e. Di xezel û teşeyên ji xezelê dirêjtir de (quesîde, murebbe', muxemmes û hwd, terkîb-tercî, mesnewiyen dirêj) mexles tê bikaranîn, lêbelê di teşeyên ji xezelê biçûktir de (rubaî, dubeytî, qit'eyen biçûk û ferd) ji bilî hin awarteyan, mexles nayê bikaranîn.

Navêن ku nazim/helbestvan wek mexles bi kar tînin, carinan nav, yan leqebêن wan ên eslî bixwe ne, lêbelê bi piranî peyvîn cuda ne ku aliyêن wan ên curbicur nîşan didin.

3. TARÎXA BIKARANÎNA MEXLESÊ DI EDEBIYATA KURDÎ DE

Daneyêن li ber destan bi awayekî aşkera nîşan didin ku tradîsyona bikaranîna mexlesê ku di edebiyatêن Farisî û Tirkî de hatiye şopandin, di edebiyata Kurdî de

jî diyardeyeke bingehîn û taybetiyeke jêneger a helbestê ye. Ev tradîsyon di tarîxa edebiyata Kurdî de ji aliyê piraniya helbestvanan ve hatiye şopandin. Dikare bê gotin ku ji helbestvanen bihêz heta bi yên lawaz, ji yên navdar heta bi yên ne navdar, ji yên xwedî dîwan heta bi yên ne xwedî dîwan hemû helbestvanen klasîk xwedî mexles in. Bêguman ji bo ku seyra tarîxî ya mexlesen edebiyata Kurdî ya klasîk bê şopandin, berî her tiştî divê mexlesen ku ji aliyê helbestvanen Kurd ve hatine bikaranîn bêñ tesbîtkirin. Li jêrê di çarçoveya mexlesen edebiyata Kurdî ya klasîk de du lîste dê bêñ pêşkêşkirin. Lêbelê qada mexlesen Kurdî qadeke gelekî berfireh e û eger em bibêjin ku beramberî tevahiya tarîxa edebiyata Kurdî tê, dê ne şaş be. Ji ber vê yekê, di vê gotarê de angaşa me ne berhevkirin û tesbîtkirina hemû mexlesen edebiyata Kurdî ya klasîk e û aşkera ye ku ev yek di çarçoveya gotarekê de ne pêkan e. Loma lîsteyen ku li jêrê di vê biwarê de dê bêñ pêşkêşkirin, divê wek lîsteyen destpêkî bêñ nirxandin. Guman tuneye ku ji vir şünde ev lîste dê gelekî bêñ dewlemendkirin.

Di lîsteya yekem de di çarçoveya dîyalektên Kurdî û rêza kronolojîk de navêñ helbestvanan hatine rêzkirin û mexlesen wan li hemberî wan hatine danîn. Armanc ji vê yekê ew e ku profila mexlesen helbestvanan li gor diyalekt û qonaxen tarîxî derkeve meydanê. Çawa ku hat gotin, di lîsteyê de pêşî navêñ helbestvanan, piştre li kêleka wan mexlesen wan cih digirin. Bêguman danîna navêñ helbestvanan ji bo aşkerabûna xwediyyen mexlesan girîng e. Bi vê rîyê dê bê dîtin ku gelek kesayetên navdar di heman demê de xwedî mexles in jî. Bi baweriya me ev yek girîng e. Lewra bi taybefî di edebiyata Kurmancî de mexlesen gelek helbestvanan, digel ku hene jî, nayêñ zanîn û ev helbestvan tenê bi navêñ xwe yên eslî tên naskirin. Dîsa bi armanca ku xwediyyen mexlesen bêñ naskirin, di nav analîzan de jî navêñ eslî û mexles bi hev re dê bêñ bikaranîn. Ji ber ku ev lîste kategorîk û kronolojîk e, di rêzkirina navêñ helbestvanan de rêza alfabetîk li ber çavan nehatiye girtin.

NAVÊ ESLÎ / MEXLES

Edebiyata Lorî

1. Baba Tahirê 'Uryan (s.s. XI) / **Tahir** (Kara, 2012, r. 154-163)

Edebiyata Goranî

1. Mela Perîşanê Dînewerî (k.d. 1421) / **Mela, Perîşan, Perîş** (Dînewerî, wr. 28, 35, 48, 49)
2. Mela Mistefa Ehmed Bésaranî (k.d. 1745) / **Bêsaranî, Mehzûnî** (Xeznedar, II, 39; Temo, II, 1415)
3. Xanay Qubadî (k.d. 1754) / **Xana** (Qubadî, 2016)
4. Seyîd Ebdullah Mealî (k.d. 1784) / **Mealî, 'Ebdî** (Seleffî & Doskî, r. 127)
5. Welî Dîwane (k.d. 1801) / **Welî Dîwane** (Xeznedar, II, 103)
6. Silêman Begê Zengene (k.d. 1803) / **Zebûnî** (Seleffî & Doskî, r. 155)

7. Mewlana Xalidê Şarezorî (k.d. 1826) / **Nûrî** (Xeznedar, III, 26)
8. Huseynê Berzençî (k.d. 1834) / **Elme'î** (Selefî & Doskî, r. 141)
9. Mîrza Şeff'ê Camerêzî (k.d. 1836) / **Şeffî'** (Xeznedar, III, 247)
10. Xulam Riza Erkewazî (k.d. 1840) / **Xulam** (Xeznedar, III, 205)
11. Mah Şeref Xanima Kurdistanî (k.d. 1848) / **Mestûre** (Selefî & Doskî, r. 176)
12. Mihemed Silêmanê Hewramanî (k.d. 1848) / **Seydî** (Xeznedar, III, 263)
13. Melay Cebarî (k.d. 1876) / **Mela** (Xeznedar, III, 340)
14. Seyîd Ye'qûbê Mahîdeşî (k.d. 1875) / **Seyyid, Sey Yaqo** (Xeznedar, IV, 77)
15. Mehmûdê Ehmedê Zengene (k.d. 1878) / **Funûnî** (Selefî & Doskî, r. 194)
16. Mihemed Lûte Cebarî (k.d. 1878) / **Feqîr** (Selefî & Doskî, r. 187)
17. Ehmed Begê Komasî (k.d. 1878) / **Ehmed** (Xeznedar, III, 317)
18. Mela Ebdurehimê Tawegozî (k.d. 1882) / **Me'dûmî** (Xeznedar, III, 352)
19. Mihemed Îmameddîn Senendecî (k.d. 1883) / **Heyran** (Selefî & Doskî, r. 181)
20. Mihemedê Yûsif (k.d. 1883) / **Rencûrî** (Selefî & Doskî, r. 192)
21. Şêx 'Ebdullahê Daxî (s.s. XIX) / **Daxî** (Selefî & Doskî, r. 172)
22. Mir Miheme Salihê Ni'metullahî (k.d. 1905) / **Seyîd Salih** (Xeznedar, IV, 243)
23. Mîrza Ebdulqadirê Paweyî (k.d. 1910) / **Qadir** (Xeznedar, IV, 383)
24. 'Ebdulhemîdê Kanîmişkanî (k.d. 1916) / **Irfan** (Selefî & Doskî, r. 257)
25. Xelîl Xidrê Kakeyî (k.d. 1923) / **Xelîl, Xelîl Munewwer, Mihemed Xelîl, Mela Xelîl, Mîrza Xelîl, Mîrza** (Xeznedar, IV, 505)
26. 'Ebdulmecîd Meliku'l-Kelam (k.d. 1925) / **Mecdî** (Selefî & Doskî, r. 283)
27. Kerîm Mehmûdê Kûhsarî (1978) / **Xemgîn, Temkîn** (Selefî & Doskî, r. 298)
28. Mihemed Emînê Kake Şêxê Tewîleyî (k.d. 1982) / **Kardoxî** (Xeznedar, VII, 295)

Edebiyata Kurmancî

1. Eliyê Herîrî (s.s. XVI) / **Elî, Şêx Elî, Huseynî** (Adak, 2015, r. 202)
2. ? (s.s. XVI) / **Hemîdî** (Doskî, b.d., r. 19-22)
3. Feqiyê Teyran (k.d. 1632) / **Feqî, Miksî, Mîm û Hê** (Adak, 2015, r. 238)
4. Melayê Cizîrî (k.d. 1640) / **Mela, Nîşanî, Ehmed** (Adak, 2015, r. 208-209)
5. Mîr Îmadedînê Hekkarî (s.s. XVI-XVII) / **Sebûrî** (Doskî, 2016, Nûpelda)
6. Şêx Şemsedînê Exlatî (s.s. XVII) / **Xelwetî** (Adak, 2015, r. 248)
7. Şêx Ehmedê Xanî k.d. (1709) / **Xanî** (Xanî, 2009; Xanî, b.d.)
8. Mihemed Qasim Bayezîdî (s.s. XVII) / **Xanî** (Selefî & Doskî, r. 85)
9. Remezanê Cizîrî (s.s. XVII) / **Remezan, Remezanê Cizîrî, Îbn Dewdan /** (Badî, 2011, r. 57-80.)
10. Axaokê Bêdarî (s.s. XVII) / **Xeyn û Elîf** (Adak, 2015, r. 263)
11. Xalid Axayê Zêbarî (s.s. XVII) / **Lixer** (Adak, 2015, r. 264)
12. Mela Remazanê Ebbasî (s.s. XVII) / **Remezanê Kurdikî** (Çelebî, 2010)
13. Mela Huseyrê Bateyî (s.s. XVIII) / **Bateyî, Melayê Bateyî** (Sadinî, 2010, r. 20)
14. Selîmê Silêman (s.s. XVIII) / **Selîmî** (Adak, 2015, r. 286)
15. Harisê Bedlîsî (s.s. XVIII) / **Sewadî** (Adak, 2015, r. 289)
16. Mela Mensûrê Girgaşî (s.s. XVIII) / **Mensûr** (Adak, 2015, r. 294)
17. Ebdulletîfê Şoşî (s.s. XVIII) / **Seyfî** (Adak, 2015, r. 294)
18. Muradxanê Bazîdî (s.s. XVIII) / **Muradxan** (Adak, 2015, r. 296)

19. ? (s.s. XVIII) / **Xewsî** (Ulugana, 2016)
20. ? (s.s. XVIII) / **Macin** (Adak, 2015, r. 299)
21. ? (s.s. XVIII) / **Mîna** (Adak, 2015, r. 300)
22. ? (s.s. XVIII) / **Sadiq** (Adak, 2015, r. 300)
23. ? (s.s. XVIII) / **Mun'îmî** (Adak, 2015, r. 339)
24. ? (s.s. XVIII) / **Ze'îfi** (Adak, 2015, r. 339)
25. Mela Meqsûdê Durefşanî (s.s. XVIII) / **Durefşanî** (Mecmû'e, j. Kurd 26)
26. Şêx Xalidê Zêbaryê Yekem (s.s. XVIII) / **Xalidê Zêbarî** (Adak, 2015, r. 301)
27. Mela Ebdullahê Bazîlî (s.s. XVIII) / **Bazîlî** (Seleffî & Doskî, r. 126)
28. Mela Îbrahîmê Katûnî (k.d. 1789?) / **Racî** (Doskî, b.t., r. 141)
29. Mihemed Teyar Paşa (k.d. 1817) / **Xerîbî** (Adak, 2015, r. 334)
30. Mihemed Cewad (k.d. 1826?) / **Siyahpoş** (Adak, 2015, r. 311)
31. Şêx Ehmedê Feqîr (k.d. 1832?) / **Ehmed, Feqîrê Ehmed** (Acar, 2016)
32. Mustefa Begê Hekarî (k.d. 1841?) / **Pertew** (Adak, 2015, r. 319)
33. Mela Xelilê Sêrtî (k.d. 1843) / **Şewqî** (Adak, 2015, r. 331)
34. Şêx Nûreddînê Birîfkanî (k.d. 1850?) / **Nûri** (Birîfkanî, 2002)
35. ? (k.d. 1850) / **Weda'î** (Adak, 2015, r. 321)
36. Mela Mihemedê Pîzânî (k.d. 1850) / **Madih** (Doskî, b.t., r. 183)
37. Şêx Evdilqadirê Xanî (s.s. XIX) / **Evdilqadirê Xanî** (Doskî, b.d., r. 201-204)
38. Bekir Begê Erizî (s.s. XVIII-XIX) / **Bê û Kaf** (Adak, 2015, r. 333)
39. Şêx Ebdulezîzê Bedlisî (s.s. XIX-XX) / **Şeyda, 'Ebdul'ezîz** (Ertekin, 2018, r. 13)
40. Mela Mihemedê Colemêrgiyê Xanî (s.s. XIX) / **Şewqî** (Doskî, 2016)
41. Xalid Beg (s.s. XIX) / **Halet** (Seleffî & Doskî, r. 235)
42. Mihemed Xerîbê Şoşî (s.s. XIX) / **Xerîbî** (Şoşî, 2012, r. 42)
43. Mela Ebdurrehmanê Melekendî (k.d. 1874) / **Abidê Rehman** (Doskî, 2011, r. 35-41)
44. Mela Îbrahîmê Coqreşî (k.d. 1881) / **Bureyha** (Doskî, 2011, r. 39-43)
45. Mihemed Se'îdê Mizûrî (k.d. 1884) / **Mîhrî** (Seleffî & Doskî, r. 307)
46. Şêx Mihemedê Firsaffî (k.d. 1892) / **Hezîn** (Seleffî & Doskî, r. 321)
47. Şêx Muhyedînê Hênî (k.d. 1897?) / **Sa'i, Heqî** (Adak, 2016, r. 17-20)
48. Şêx Ebdulqadirê Hezanî (k.d. 1905) / **Ebdulqadir, Ebdulqedîr** (Hezanî, 2016)
49. Şêx Evdirehmanê Aqtepî (k.d. 1907) / **Rûhî** (Aqtepî, 2011)
50. Şêx Mihemed Can (k.d. 1909) / **Xakî** (Can, 1992)
51. Seydayê Licî (k.d. 1911) / **Hadî** (Licewî, 1992)
52. Şêx Mustefayê Sîsî (k.d. 1914) / **Mustefa (Qewmanî**, 2011, r. 29-33)
53. Şêx Se'îdê Meczûb (k.d. 1914/1916) / **Se'îd** (Şêxê Meczûb, b.d.)
54. Şêx Ubeydullah (k.d. 1919) / **Şewqî** (Korkusuz, 2004, r. 299-301).
55. Tahayê Maî (k.d. 1919) / **Behâî** (Seleffî & Doskî, r. 254)
56. Mela Umerê 'Aşıq (k.d. 1927) / **Laxer, Miksî** (Yılmaz, 2019, r. 21)
57. Feqe Reşîd (k.d. 1932) / **Feqî** (Adak, 2015, r. 332)
58. Mela Nesredînê Zoqî (k.d. 1935) / **Nuseyî** (Zoqî, b.t.)
59. Mela Ehmedê Heyderî (k.d. 1937) / **Ehmed** (Heyderî, S. M. E., 2012)
60. Şêx Mihemed Kerbelayî (k.d. 1939) / **Bedrî, Kerbelayî** (Pertev, 2012, r. 16)
61. Şêx Hesîb (k.d. 1947) / **Hesbî** (Axtepî, 2009)
62. Şêx Mihemed Eskerî (k.d. 1952) / **Eskerî** (Şêx Eskerî, 1989)

63. Mela 'Ebdusselamê Cizîrî (k.d.1952) / **Nacî** (Keşkûla Kurmancî)
64. Şêx Muhemed Hadiyê Qewmanî (k.d. 1956) / **Hadî** (Qewmanî, 2011, r. 37-65)
65. Seyîd Qedrî Haşimî (k.d.1961) / **Bedrî, Zeynî, Qedrî, Hezîn** (Doru, 2016, r. 68)
66. Şêx Tahirê Şoşî (k.d.1962) / **Tahir** (Şoşî, 2012, r. 44)
67. Mela Ehmedê Nalbend (k.d. 1963) / **Muxlis** (Nalbend, 1998)
68. Mela Zahirê Tendûrekî (k.d. 1966) / **Zahir, Zuweyhir** (Tendûrekî, 2007, r. 9)
69. Selaheddînê Gimgimî (1967) / **Serda** (Serda, 2018)
70. Seyîd Eliyê Findikî (k.d.1968) / **'Elî** (Findikî, 2010)
71. Fehmî Begê Peçarî (k.d. 1969) / **Namî, Fehmî, Fehîm** (Peçarî, 1956)
72. Şêx 'Ebdurehmanê Şawirî (1974) / **Mêrgî, 'Ebdurehman** (el-Mêrgî, 2013)
73. Seydayê Hacî Fetahê Hezroyî (k.d.1975) / **Fethî** (Hezroyî, 2012)
74. Ehmed Namî (k.d. 1975) / **Namî** (Selefî & Doskî, r. 213)
75. Şêx Memdûhê Birîfkanî (k.d. 1976) / **Exlatî, Memdûh, Memdûhê Birîfki** / (Birîfkanî, 2001)
76. Mela Mihemed Nûrî (k.d.1977) / **Neclu'l-ewhedî** (Amidî, 2004)
77. Şêx Qutbedînê Korikî (k.d.1979) / **Xakî** (Adak, 2012, r. 477)
78. Mela Ebdusselamê Mermerî (k.d. 1982) / **'Ubeyd** (Mehmet Yalar)
79. Mela Sîraceddinê Xelîlî (k.d.1983) / **Sîraceddin, Mihemed Sîraceddin, Mihemed Sîrac, Sîrac, Sîracê Xelîlî, Sîn, Sîrac Ataç, Sîn û Cîm** (Gümüş, 2019, r. 6-10)
80. Mela Şêxmûsê Hesarî (k.d. 1983) / **Cegerxwîn** (Cegerxwîn, 2003)
81. Mela Nezîrê Bedewî (k.d.1986) / **Dahî** (Bedewî, 2004)
82. Şêx Mûsayê Şexanî (k.d.1990) / **Mûsa** (eş-Şeyxanî, 1968)
83. Mela Yasînê Şemê (k.d. 1994) / **Yusrî** (Gezer, 2015)
84. Şêx 'Ismetullahê Karazî (k.d. 1996) / **'Ismet** (Doskî, 2011, r. 177-211)
85. Mela 'Eliyê Baqustanî (k.d.2002) / **'Elî, 'Eyn û Lam û Ya** (Ertekin, 2016)
86. Naîfê Hesen (k.d. 2002) / **Tîrêj** (Selefî & Doskî, r. 379)
87. Mela Nûrullahê Godîskî (k.d.2003) / **Nûrî** (Godîskî)
88. Şêx Mihemed Emînê Heyderî (k.d.2003) / **Heyderî, Heyderîzade, Emîn, Emînê Heyderî, Heyderîzade Emîn, Heyderî Ehmed** (Heyderî, Ş. M. E., 2012)
89. Mela Hesenê Bizgûrî (k.d. 2007) / **Keleş** (Keleş, b.t.) /
90. Mela Xelîlê Mişextî (k.d. 2007) / **Mişextî** (Mişextî, 2012, r. 16)
91. Şêx Muşerrefê Xunûkî (k.d.2008) / **Xunûkî** (Sönmez, 2018)
92. Mela Xalid Korkusuz (k.d. 2011) / **Xuldî** (Ekmekçi, G. 2012)
93. Mela Mistefa Hilîliyê (k.d. 2012) / **Hişyar** (Hilîliyê, b.t.)
94. Mela 'Ebdullahê Kotaliyê (k.d. 2014) / **'Ebdullah** (Sonmez, 2018)
95. Şêx Ehmed Hilmî (k.d.2016) / **Hilmî, Ehmed** (Hilmî)
96. Mela Ehmedê Zinarexî (k.d. 2018) / **Ehmed** (Zinarexî, 2018)
97. Mela 'Elî 'Ilmî (s.s.XX) / **Cigernûr** ('Ilmî, 2012)
98. Mela 'Eliyê Botî (k.d. 2000) / **'Elî** (Arslan, 2013)
99. Mela İbrahim Paresî / **Bureyhîm** (Paresî, b.t.)
100. Mela 'Îmadeddînê Gurdilî / **Gurdilî** (Mela 'Îmadeddîn)
101. Mela Imadeddin / **Reşpojan** (Mela Imadeddin)
102. Mela 'Arifê Dêrsilavî / **'Arif** (Dêrsilavî, 2004)
103. Mela Silêmanê Kercewsî (Kurşun) / **Selman** (Kurşun, 2002)

104. Dilbikulê Cizîrî (Abdulkadir Bingöl) / **Dilkul** (Cizîrî, 2015)
105. Seyîd Şemseddîn Erzen / **Şemsi** (Erzen, 1430)
106. Ebdulqadir Înan / **Ebdulqadir** (Înan, 2014)
107. Mele Se'id (Seydayê Xelatî) / **Xelatî** (Se'îd/Xelatî 2008)
108. Seydayê Mela Husnî / **Hezîn, Husnî** (Aykaç, 2015, r. 8)
109. Mela Me'sûmê Gundşêxî / **Dilbirîn** (Mela Me'sûm)
110. Mihemed Helîmê Xursa Heftêxuhan / **Xemkûr** (Heftêxuhan, 2003)
111. Mela Mihemedê Hezanî / **Mem, Mîm; Mihemedê Hezanî** /
(Hezanî, b.t.; Hezanî, 2010, r. 69)

Edebiyata Soranî

1. Yüsif Karîzî (k.d. 1782) / **Karîzî** (Seleffî & Doskî, r. 134)
2. Mistefa Begê Sahibqiran (k.d. 1850) / **Hicrî, Kurdî** (Xeznedar, III, 168)
3. Ebdurehman Begê Sahibqiran (k.d. 1869) / **Bîmar, Rencûr, Salim** /
(Xeznedar, III, 117)
4. Mela Xidirê Mîkayîlî (k.d. 1877) / **Nalî** (Xeznedar, III, 43)
5. Şaweysê Koşkî (k.d. 1882) / **Koşk** (Xeznedar, IV, 591) /
6. Emîn Axayê Bekir Axayê Koyî (k.d. 1888) / **Exter, Emîn** (Xeznedar, IV, 48-49)
7. Mela Wesmanê Silêmanî (k.d. 1889) / **Fayeq, Hezîn** (Xeznedar, IV, 91)
8. 'Ebdulqadirê Resûlê Begzade (k.d. 1890) / **Feqê, Derwêş** (Xeznedar, IV, 383)
9. Hacî Qadirê Koyî (k.d. 1898) / **Hacî** (Xeznedar, IV, 145)
10. Omerê Xalid Begê Şalebekî (s.s.XVIII-XIX) / **Rencûrî** (Seleffî & Doskî, r. 174)
11. Mîrze Ebdurehîmê Sabraxî (k.d. 1902) / **Wefayî** (Xeznedar, IV, 347)
12. Salihê Ehmed (k.d. 1906) / **Ahî** (Xeznedar, IV, 595)
13. Mihemedê Helebceyî (k.d. 1906) / **Xakî** (Xeznedar, IV, 599)
14. Mihemedê Şêx Osmanê Belxî (k.d. 1906) / **Mehwî, Meşwî** (Xeznedar, IV, 195)
15. Kak 'Ebdullah Kak 'Elî (k.d. 1906) / **Sanî** (Xeznedar, IV, 57) /
16. Mela Salihê Nesrullah (k.d. 1909) / **Herîq** (Xeznedar, IV, 426)
17. Şêx Riza Talebanî (k.d. 1910) / **Riza, Lami'** (Xeznedar, IV, 279)
18. Şêx Selîmê Texteyî (k.d. 1911) / **Salimê Sine** (Xeznedar, IV, 605)
19. Ebdullah Begê Mîsbahuddîwan (k.d. 1916) / **Edeb** (Xeznedar, IV, 457)
20. Tahir Begê Caf (k.d. 1918) / **Tahir** (Xeznedar, IV, 565)
21. Mela Resûlê Bêtûşî (k.d. 1921) / **Menfî** (Xeznedar, IV, 69)
22. Tahirê Bêderî Berzencî (k.d. 1925) / **Fuad** (Xeznedar, V, 421)
23. Şukrî Fezlî (k.d. 1926) / **Hemmi** (Xeznedar, V, 401)
24. Mihemedê Şêx Rizayê Talebanî (k.d. 1928) / **Xalisî** (Xeznedar, V, 40)
25. Ehmedê Hacî Şêx Xenî (s.s.XIX-XX) / **Fewzî** (Xeznedar, V, 39)
26. 'Elî Beg Salar Se'îd Heyderî (s.s.XIX-XX) / **'Elî** (Xeznedar, V, 64)
27. Resûlê Mela Sadiq Mukriyanî (k.d. 1932) / **Edîb** (Xeznedar, V, 187)
28. Şêx Miheydînê Koyî (k.d. 1934) / **Nîhanî** (Xeznedar, IV, 63) /
29. Mela Mehmûdê Meznawî (k.d. 1934) / **Hicrî** (Seleffî & Doskî, r. 327)
30. Ehmed Muxtar Caf (k.d. 1935) / **Ehmed** (Xeznedar, V, 451)
31. Ehmedê Sahibqiran (k.d. 1936) / **Hemdî** (Xeznedar, V, 273)
32. Xefûrê Hacî 'Umer (k.d. 1938) / **Mîrsa, Xale Mîrsa, Mîrsa Xefûr** /
(Xeznedar, V, 167)

33. Mela 'Ebdulfetah Katibzade (k.d. 1940) / **Wehbî** (Seleffî & Doskî, r. 266)
34. Mihemed 'Ebdulla Dişeyî Sineyî (k.d. 1942) / **Mîhrî** (Xeznedar, V, 522)
35. Kak Mistefayê Hîranî Sanî (k.d. 1942) / **Sâffî** (Xeznedar, V, 325)
36. Mihemed Şerîfî Muezzin (k.d. 1942) / **Mîhrî** (Xeznedar, V, 522)
37. Necmedînê Şêx Ebdurehmanê Şorîce (k.d. 1944) / **Sâbirî** (Xeznedar, V, 389)
38. Şêx Necmedînê Ebdurehmanê Berzencî (k.d. 1944) / **Sebrî** (Kurdo, 261-263) /
39. Salih Zekî Sahibqiran (k.d. 1944) / **Şewqî** (Seleffî & Doskî, r. 246)
40. Hesenê Mîrza Qasimê Qazî (k.d. 1944) / **Hesen** (Xeznedar, V, 343)
41. Mela Mihemedê Merîwanî (k.d. 1944) / **Narî** (Xeznedar, V, 167) /
42. Mela 'Ebdullahê Mihemed (k.d. 1948) / **Zîwer** (Xeznedar, V, 229)
43. Husênenê Ebdulletîfê Mukriyanî (k.d. 1948) / **Huznî, Damaw** (Xeznedar, V, 439)
44. Faiq 'Ebdullah (k.d. 1948) / **Bêkes** (Xeznedar, V, 489) /
45. Hacî Tewfîqê Mehmûd Axa (k.d. 1950) / **Pîremêrd** (Xeznedar, V, 101)
46. Fayiqê Mela 'Ebdulahê Zêwer (k.d. 1952) / **Bextiyar** (Xeznedar, VII, 63)
47. 'Ebdullah Muftî Pênciwiênî (k.d. 1952) / **Muftî** (Xeznedar, VI, 119)
48. Mihemed Emînê Şinoyî (k.d. 1954) / **Emîn, Emînê Şinoyî** (Xeznedar, VI, 215)
49. Mehmûdê Mela Emînê Muftî (k.d. 1955) / **Bêxud** (Xeznedar, VI, 73)
50. Şêx Mehmûdê Berzencî Hefid (k.d. 1956) / **Nûrbexşî** (Xeznedar, VI, 173)
51. Xîdrî Ehmedê Nanekelî (k.d. 1957) / **Deşti** (Xeznedar, VII, 101)
52. Cebâr Axay Kanî (k.d. 1957) / **Kanî** (Xeznedar, VI, 409)
53. Şêx Nûrî Şêx Salih (k.d. 1958) / **Nûrî, Şêx Nûrî** (Xeznedar, VI, 351)
54. Hesenê Mela Ebdullahê Zerderû (k.d. 1958) / **Cewherî** (Xeznedar, VI, 63)
55. Şêx Selamê Şêx Ehmed (k.d. 1959) / **Selam** (Xeznedar, VI, 265)
56. 'Arifê Şêx Mehmûdê Qazî (k.d. 1961) / **'Urfî** (Xeznedar, VI, 393)
57. 'Ebdulahê Silêman Beg (k.d. 1962) / **Goran** (Xeznedar, VI, 573)
58. Mela Mistefayê Dêlêjeyî (k.d. 1963) / **Sefwet** (Seleffî & Doskî, r. 329)
59. Mihemedê Çirustanî (k.d. 1963) / **Çirustanî** (Xeznedar, VI, 265)
60. Mihemedê Şêx Evdilqadirê Dolasî (k.d. 1965) / **Qanî'** (Xeznedar, VI, 435)
61. 'Ebdurehman Begî Baba (k.d. 1967) / **Babe** (Xeznedar, VI, 95)
62. 'Ebdullay Mela Mihamedê Berzencî (k.d. 1967) / **'Aciz** (Xeznedar, VII, 587)
63. Necmedînê Mela Resûlê Dêlêje (k.d. 1968) / **Arî** (Xeznedar, VII, 129)
64. Reşîdê Mehmûd Axay Ferxe (k.d. 1968) / **Feramerz** (Xeznedar, VII, 41)
65. Mela Ehmedê Dêlêje (k.d. 1970) / **Fayîz** (Xeznedar, V, 49) /
66. Hesenê 'Ebdulqadirê Biyare (k.d. 1971) / **Şayiq, Şaho** (Xeznedar, VI, 149)
67. 'Ebdullahê M. Mewlûd Koyî (k.d. 1971) / **Xadîm** (Xeznedar, VI, 311)
68. Memendê Resûl Axay Mîrawdelî (k.d. 1973) / **Fanî** (Xeznedar, VII, 141)
69. Mihemedê Şêx Ehmedê Merdûxî (k.d. 1973) / **Wîsalî** (Xeznedar, VI, 483)
70. 'Eliyê Babîr Axa (k.d. 1974) / **Kemalî** (Xeznedar, VI, 187)
71. Es'edê Mela Xalidê Mehwî (k.d. 1976) / **Es'ed** (Xeznedar, VI, 463)
72. Mihemed Marifê Mela Resûl (k.d. 1976) / **Remzî** (Xeznedar, VI, 483)
73. Ebûbekrê Şêx Celalê Derbendîxan (k.d. 1979) / **Hewrî** (Xeznedar, VII, 229)
74. Ehmedê Mistefayê Koyî (s.s. XX) / **Dilzar** (Xeznedar, VII, 387)
75. Ehmedê Hesen Beg (s.s. XX) / **Herdî** (Xeznedar, VII, 439)
76. Xalidê Hemed Axay Mukrî (s.s. XX) / **Hêdî** (Xeznedar, VII, 537)

77. Xelîlê Resûlê Sincawî (k.d. 1985) / **Wafî, Muxlis** (Xeznedar, VII, 169)
78. Mihemedê Şêx Husênê Helebce (k.d. 1985) / **Hilmî** (Xeznedar, VII, 115)
79. Nasixê 'Ebdullahê Heyderî (k.d. 1986) / **Nasix** (Xeznedar, VI, 475)
80. Mihemed Emînê Seyîd Hesenê Mukrî (k.d. 1986) / **Hêmin** (Xeznedar, VII, 423)
81. Mihemed Mewlûdê Sablaxî (k.d. 1987) / **Mem** (Xeznedar, VII, 489)
82. Ehmedê Derwêş/Exol (k.d. 1988) / **Ehmed** (Xeznedar, VII, 209)
83. Lutfiyê Şêx Rizayê Qûle (k.d. 1989) / **Lutfî** (Xeznedar, VII, 19)
84. Kamilê 'Ebdulhekîmê Zenbîlî (k.d. 1989) / **Awat, Kamil, Îmamî** / (Xeznedar, VI, 549)
85. Mihemedê Mihemed Emînê Qadir (k.d. 1990) / **Kakey Fellah** / (Xeznedar, VII, 563)
86. Mihemed Salihê Mela Ehmed (k.d. 1990) / **Dîlan** (Xeznedar, VII, 499)
87. Ebdurehman Şerefkendî (k.d. 1991) / **Hejar** (Xeznedar, VII, 377)
88. Burhanê Mihemedê Doxremeçî (k.d. 1991) / **Cahid** (Xeznedar, VII, 321)
89. Osmanê Hebîbê Koyî (k.d. 1992) / **'Ewnî** (Xeznedar, VII, 265)
90. Mihemed 'Eliyê Mihemed Salih (k.d. 1994) / **Medhoş** (Xeznedar, VII, 347)
91. Mihemedê Tahayê Balîsanî (k.d. 1995) / **Da'î** (Selefî & Doskî, r. 374)
92. Mes'ûdê Mela 'Ebdullay Şenexeyî (k.d. 1998) / **Bêbeş** (Xeznedar, VII, 627)
93. 'Ebasê 'Eliyê Tala Bokan (k.d. 1998) / **Heqîqî** (Xeznedar, VI, 527)
94. Mela 'Ebdulkerîmî Muderrîs (k.d. 2005) / **Namî** (Se'îd, 2016)

Edebiyata Zazakî

1. Mela Ehmedê Xasî (k.d. 1951) / **Xasî** (Xasî, 1985)
2. Osman Es'ed Efendi Babij (k.d. 1928) / **Es'ed** (Kirkan, 2018)
3. Mela Ezîz Bekî / **Çepaxçûrî** (Bekî, 2015)
4. Mihemedê Kavarî / **Kavarî** (Kavarî, 1391)
5. WK Merdimîn / **Merdimîn** (Merdimîn, 2015)

Lîste 1: Mexles li Gor Dîyalektên Kurdî û Rêza Kronolojîk

Dema em di çarçoveya vê lîsteyê de li tradîsyona bikaranîna mexlesê dinêrin, em dibînin ku di hemû qadêن edebiyata Kurdî ya klasîk de helbestvanê qonaxa destpêkê di helbestên xwe de mexles bi kar anîne. Di çarçoveya tevahiya tarîxa edebiyata Kurdî ya klasîk de, mexles cara pêşî di Kurdiya Lorî de ji aliyê Baba Tahirê Hemedanî ve hatîye bikaranîn. Baba Tahir, di çar xezelên xwe yênu ku ji aliyê Sabah Kara ve hatine weşandin de mexlesa "Tahir" bi kar anîye (Kara, 2012, r. 154-163). Mela Perîşan jî ku wek helbestvanê herî kevin ê Kurdiya Goranî tê qebûlkirin di *Perîşannameyâ* xwe de mexlesên "Perîş", "Perîşan" û "Mela" bi kar anîne (Perîşanname, wr. 28, 35, 48, 49).¹ Çawa ku di lîsteyê de tê dîtin, helbestvanên pêşî yêne edebiyata Kurmancî yêne wek Hemîdî, Eliyê Herîrî (Elî, Şêx Elî, Huseynî), Mela Ehmedê Cizîrî (Mela, Nîşanî, Ehmed), Feqiyê Teyran (Feqî, Miksî, Mîm û

1 Ji bo ku ev agahî daye min spasiyêne xwe pêşkêşî Erol Şaybak dikim.

Hê), Mîr Îmadedînê Hekarî (Sebûrî) û Şêx Şemsedînê Exlatî (Xelwetî) di sedsalên XVI-XVIIem de helbestên xwe digel mexlesên xwe nivîsîne. Bi heman rengî di Kurdiya Soranî de jî her sê helbestvanên damezirîner Nalî, Kurdî û Salim edebiyata Soranî ya klasîk digel vê tradîsyonê damezirandine û şohreta wan bi mexlesên wan çê bûye. Herî dawî em dibînin ku di Kurdiya Zazakî de jî Melayê Xasî (Xasî) û Osman Es'ed Efendi (Es'ed) di berhemên pêşî yên edebiyata Zazakî de mexles bi kar anîne. Bi kurtî, mexles di hemû diyalektên edebiyata Kurdî de di qonaxa destpêkê de hatiye bikaranîn. (Kurdiya Lorî: sedsla XIem, Kurdiya Goranî: sedsla XVem, Kurdiya Kurmancî: sedsla XVIem, Kurdiya Soranî: sedsla XIX û Kurdiya Zazakî: sedsal XXem). Çawa ku hatibû gotin, di edebiyata Farisî de bikaranîna mexlesê di sedsla XIIIem de belav bûye û di edebiyata Tirkî de jî di sedsla XVem de dest pê kiriye ku ev her du jî qonaxê pişî damezirandinê ne. Dema em ji vî aliyî ve li edebiyata Kurdî dinêrin, em dibînin ku di hemû diyalektên edebiyata Kurdî de mexles di qonaxa damezirandinê bixwe de hatine bikaranîn. Loma jî ev yek di destpêka bikaranîna mexlesê de wek xweseriyeke cudaker a edebiyata Kurdî dikare bê nirxandin.

Tradîsyona bikaranîna mexlesê, di qonaxê peyrew ên tarîxa edebiyata Kurdî de jî dom kiriye û gîhîstiye heta bi roja me. Eger em ji Baba Tahir bidin destpêkirin maweya tarîxî ya bikaranîna mexlesê dê beramberî 1000 salî were. Lîbelê divê bê gotin ku ji Baba Tahir heta bi Mela Perîşan di edebiyata Kurdî ya hewzeya Îranê de rawestaneke edebiyata nivîskî heye û di vê hewzeyê de edebiyata Kurdî ji Mela Perîşan şûnde çalak bûye. Ji ber vê jî dema em Mela Perîşan esas bigirin, emê bibînin ku ji Mela Perîşan û vir ve tradîsyona bikaranîna mexlesê nêzî 600 salî di edebiyata Kurdî ya klasîk de bê rawestan dom kiriye. Herçiqas bikaranîna mexlesê di edebiyata Kurdî ya klasîk de wek tradîsyonekê rûniştibe jî, hin helbestvanên ku bi şêweya klasîk helbest nivîsîne, lîbelê ji ber sedemên curbicur di hemû helbestên xwe de, yan jî di hin helbestên xwe de mexles bi kar neanîne jî tê dîtin. Bêguman bikarneanîna mexlesê ji aliyê hin helbestvanan ve tiştekî asayî ye. Çawa ku li jorê jî derbas bû, ev yek di edebiyatên dî yên İslâmî de jî tê dîtin. Li aliyekî dî helbestvanên ku di sedsla XXem de bi şêweya klasîk dest bi helbestê kirine lîbelê piştre dest bi helbesta modern kirine, di helbestên xwe yên klasîk de mexles bi kar anîne, lîbelê di yên modern de terka mexlesê kirine. Ji bo vê yekê di edebiyata Soranî de Goran ('Ezîz, 2018, r. 47) û di ya Kurmancî de jî Cegerxwîn wek nimûne dikarin bêن dayîn.

Di lîsteya jorîn de bi gişî 239 helbestvanên ku di tarîxa edebiyata Kurdî ya klasîk de mexles bi kar anîne cih digirin. Ji van helbestvanan 111 heb di nav edebiyata Kurmancî, 94 heb di nav edebiyata Soranî, 28 heb di nav edebiyata Goranî, 5 heb di nav edebiyata Zazakî û hebek jî di nav edebiyata Lorî de cih digirin. Li vê derê pêwist e em dupat bikin ku ev jimarênu ku hatine tesbîtkirin ne lîmîten jorîn in.

Di lîsteya jêrîn de ji heman mexlesên ku di lîsteya jorîn de cih digirin bi awayekî alfabetîk hatine rêzkirin û li hemberî wan navê helbestvanan hatine danîn. Pêwîst e bê îfademkirin ku ev lîste bi taybefî bi mebesta sûdêن pratîk hatiye amadekirin. Bi rêya vê lîsteyê xwediyê eslî yên mexlesan bê hêsanî dê bêن dîtin.

MEXLES / NAV

1. 'Abidê Rehman / Mela Ebdurrehmanê Melekendî
2. 'Aciz / 'Ebdullay Mela Mihemedê Berzencî
3. 'Arif / Mela 'Arifê Dêrsilavî
4. 'Ebdî / Seyîd Ebdullah Mealî
5. 'Ebdul'ezîz / Şêx Ebdulezîzê Bedlîsî
6. 'Ebdullah / Mela 'Ebdullahê Kotaliyê
7. 'Ebdulqadir / Ebdulqadir Înan
8. 'Ebdulqadir / Şêx Ebdulqadirê Hezanî
9. 'Ebdulqedîr / Şêx Ebdulqadirê Hezanî
10. 'Ebdurehman / Şêx 'Ebdurehmanê Şawirî
11. 'Evdilqadirê Xanî / Şêx 'Evdilqadirê Xanî
12. 'Elî / 'Elî Beg Salar Se'îd Heyderî
13. 'Elî / Mela 'Eliyê Botî
14. 'Elî / Seyîd Eliyê Findikî
15. 'Elî / Eliyê Herîrî
16. 'Elî / Mela 'Eliyê Baqustanî
17. 'Eskerî / Şêx Mihemed Esker
18. 'Ewnî / Osmanê Hebîbê Koyî
19. 'Eyn û Lam û Ya / Mela 'Eliyê Baqustanî
20. 'Irfan / 'Ebdulhemîdê Kanîmişkanî
21. 'Ismet / Şêx 'Ismetullahê Karazî (1996)
22. 'Urfî / 'Arifê Şêx Mehmûdê Qazî
23. Ahî / Salihê Ehmed
24. Arî / Necmedînê Mela Resûlê Dêlêje
25. Awat / Kamilê 'Ebdulhekîmê Zenbîlî
26. Babe / 'Ebdurehman Begî Baba
27. Bateyî / Mela Huseynê Bateyî
28. Bazîlî / Mela Ebdullahê Bazîlî
29. Bê û Kaf / Bekir Begê Erizî
30. Bêbes / Mes'ûdê Mela 'Ebdullay Şenexeyî
31. Bedrî / Seyîd Qedrî Haşimî
32. Bedrî / Şêx Mihemed Kerbelayî
33. Behâî / Tahayê Maî
34. Bêxew / Mela Beşîrê Bedewî
35. Bextiyar / Fayiqê Mela 'Ebdulahê Zêwer
36. Bêkes / Faiq 'Ebdullah
37. Bîmar / Ebdurehman Begê Sahibqiran
38. Bêsaranî / Mistefa Ehmed Bêsaranî
39. Bêxud / Mehmûdê Mela Emînê Muftî
40. Bureyha / Mela Îbrahîm Çoqreşî
41. Bureyhîm / Mela İbrahim Paresî
42. Cahid / Burhanê Mihemedê Doxremeçî
43. Cegerpel / Ehmedê Ebdullahê Goyanî
44. Cegerxwîn / Mela Şêxmûsê Hesarî
45. Cewherî / Cewherî
46. Cigernûr / Mela 'Elî 'Ilmî
47. Çirustanî / Mihemedê Çirustanî
48. Da'î / Mihemedê Tahayê Balîsanî
49. Dahî / Mela Nezîrê Bedewî
50. Damaw / Husênê Ebdulletifê Mukriyanî
51. Daxî / Şêx 'Ebdullahê Daxî
52. Derwêş / 'Ebdulqadirê Resûlê Begzade
53. Deşî / Xidrê Ehmedê Nanekeli
54. Dîlan / Mihemed Salihê Mela Ehmed
55. Dilbirîn / Mela Me'sûmê Gundşêxî
56. Dilkul / Dilbikulê Cizîrî (Abdulkadir Bingöl)
57. Dilzar / Ehmedê Mistefayê Koyî
58. Durefşanî / Mela Meqsûdê Durefşanî
59. Edeb / Ebdullah Begê Mîsbahuddîwan
60. Edîb / Resûlê Mela Sadiq Mukriyanî
61. Ehmed / Melayê Cizîrî
62. Ehmed / Ehmed Begê Komasî
63. Ehmed / Ehmed Muxtar Caf
64. Ehmed / Ehmedê Derwêş/Exol
65. Ehmed / Mela Ehmedê Nalbend
66. Ehmed / Mela Ehmedê Xelatî
67. Ehmed / Mela Ehmedê Zinarexî
68. Ehmed / Melah Ehmedê Heyderî
69. Ehmed / Şêx Ehmed Hilmî
70. Ehmed / Şêx Ehmedê Feqîr
71. Elme'î / Huseynê Berzencî
72. Emîn / Mihemed Emînê Şinoyî
73. Emîn / Emîn Axayê Bekir Axayê Koyî
74. Emîn / Şêx Mihemed Emînê Heyderî
75. Emînê Heyderî / Şêx Mihemed Emînê Heyderî

76. Emînê Şinoyî / Mihemed Emînê Şinoyî
 77. Es'ed / Osman Es'ed Efendi Babij
 78. Exlatî / Şêx Memdûhê Birîfkanî
 79. Exter / Emîn Axayê Bekir Axayê Koyî
 80. Fanî / Memendê Resûl Axay Mîrawdelî
 81. Fayeq / Mela Wesmanê Silêmanî
 82. Fayîz / Mela Ehmedê Dêléje
 83. Feqê / 'Ebdulqadirê Resûlê Begzade
 84. Feqî / Feqe Reşîd
 85. Feqî / Feqiyê Teyran
 86. Feqîrê Ehmed / Şêx Ehmedê Feqîr
 87. Feramerz / Reşîdê Mehmûd Axay Ferxe
 88. Fethî / Seydayê Hacî Fetahê Hezroyî
 89. Fehmî / Fehmî Begê Peçarî
 90. Fehîm / Fehmî Begê Peçarî
 91. Fewzî / Ehmedê Hacî Şêx Xenî
 92. Fuad / Tahirê Bêderî Berzencî
 93. Funûmî / Mehmûdê Ehmedê Zengene
 94. Goran / 'Ebdulahê Silêman Beg
 95. Gurdilî / Mela Îmadeddinê Gurdilî
 96. Hacî / Hacî Qadirê Koyî
 97. Hadî / Seydayê Licî
 98. Hadî / Şêx Muhemmed Hadiyê Qewmanî
 99. Halet / Xalid Beg
 100. Hêdî / Xalidê Hemed Axay Mukrî
 101. Hejar / Ebdurehman Şerefkendî
 102. Hemdî / Ehmedê Sahibqiran
 103. Hêmin / Mihemed Emînê Seyîd
 Hesenê Mukrî
 104. Hemmî / Şukrî Fezlî
 105. Heqî / Şêx Muhyedînê Hêni
 106. Heqîqî / 'Ebasê 'Eliyê Tala Bokan
 107. Herdî / Ehmedê Hesen Beg
 108. Herîq / Mela Salihê Nesrullah
 109. Hesbî / Şêx Hesbî
 110. Hesen / Hesen Mîrza Qasimê Qazî
 111. Hewrî / Ebûbekê Şêx Celalê Derbendîxan
 112. Heyderî / Şêx Mihemed Emînê Heyderî
 113. Heyderî Ehmed / Şêx Mihemed Emînê
 Heyderî
 114. Heyderîzade Emîn: Şêx Mihemed
 Emînê Heyderî
 115. Heyderîzade / Şêx Mihemed Emînê
 Heyderî
 116. Heyran / Mihemed Îmameddin
 Senendecî
 117. Hezîn / Seydayê Mela Husnî
 118. Hezîn / Mela Wesmanê Silêmanî
 119. Hezîn / Seyîd Qedrî Haşimî
 120. Hezîn / Şêx Mihemedê Firsafî
 121. Hicrî / Mela Mehmûdê Meznawî
 122. Hicrî / Mistefa Begê Sahibqiran
 123. Hilmî / Mihemedê Şêx Husenê Helebce
 124. Hilmî / Şêx Ehmed Hilmî
 125. Hişyar / Mela Mistefa Hilîliyê
 126. Huseynî / Eliyê Herîrî
 127. Husnî / Seydayê Mela Husnî
 128. Huznî / Husenê Ebdulletîfê Mukriyanî
 129. Îbn Dewdan / Remezanê Cizîrî
 130. Îmamî / Kamilê 'Ebdulhekîmê Zenbîlî
 131. Kakey Fellah / Mihemedê Mihemed
 Emînê Qadir
 132. Kamil / Kamilê 'Ebdulhekîmê Zenbîlî
 133. Kanî / Cebar Axay Kanî
 134. Kardoxî / Mihemed Emînê Kake Şêxê
 Tewileyî
 135. Karîzî / Yûsif Karîzî
 136. Kavarî / Mihemedê Kavarî
 137. Keleş / Mela Hesenê Bizgûrî
 138. Kemalî / 'Eliyê Babîr Axa
 139. Kerbelayî / Şêx Mihemed Kerbelayî
 140. Koşk / Şaweysê Koşkî
 141. Kurdî / Mistefa Begê Sahibqiran
 142. Lami' / Şêx Riza Talebanî
 143. Lixer / Xalid Axayê Zêbarî
 144. Lixer / Mela Umerê 'Aşıq
 145. Lutfî / Lutfiyê Şêx Rizayê Qûle
 146. Macin / -
 147. Madîh / Mela Mihemedê Pîzanî
 148. Me'dûmî / Mela Ebdurehimê Tawegozî
 149. Mealî / Seyîd Ebdullah Mealî
 150. Mecdî / 'Ebdulmecîd Meliku'l-Kelam
 151. Medhoş / Mihemed 'Eliyê Mihemed Salih
 152. Mehwî / Mihemedê Şêx Osmanê Belxî
 153. Mehzûnî / Mela Mistefa Ehmed
 Bêşaranî
 154. Mela Perîşan / Mela Perîşanê Dînewerî
 155. Mela Xelîl / Xelîlê Xidrê Kakeyî
 156. Mela / Mela Perîşanê Dînewerî
 157. Mela / Melay Cebarî
 158. Mela / Melayê Cizîrî

159. Mem / Mela Mihemedê Hezanî
 160. Mem / Mihemed Mewlûdê Sabraxî
 161. Memdûh / Şêx Memdûhê Birîfkanî
 162. Memdûhê Birîfîkî / Şêx Memdûhê Birîfkanî
 163. Menfî / Mela Resûlê Bêtûşî
 164. Mensûr / Mela Mensûrê Girgaşî
 165. Merdimîn / WK Merdimîn
 166. Mêrgî / Şêx 'Ebdurehmanê Shawirî
 167. Mestûre / Mah Şeref Xanima
 Kurdistanî
 168. Meşwî / Mihemedê Şêx Osmanê Belxî
 169. Mihemedê Hezanî / Mela Mihemedê Hezanî
 170. Mihemed Sîrac / Mela Sîraceddinê Xelîlî
 171. Mihemed Sîraceddin / Mela Sîraceddinê Xelîlî
 172. Mihemed Xelîl / Xelîlê Xidrê Kakeyî
 173. Mîhrî / Mihemed 'Ebdulla Dişeyî Sineyî
 174. Mîhrî / Mihemed Se'îdê Mizûrî
 175. Mîhrî / Mihemed Şerîfê Muezzin
 176. Miksî / Feqiyê Teyran
 177. Miksî / Mela Umerê 'Aşiq
 178. Mîm û Hê / Feqiyê Teyran
 179. Mîm / Mela Mihemedê Hezanî
 180. Mîna / -
 181. Mîrza Xefûr / Xefûrê Hacî 'Umer
 182. Mîrza Xelîl / Xelîlê Xidrê Kakeyî
 183. Mîrza / Xefûrê Hacî 'Umer
 184. Mîrza / Xelîlê Xidrê Kakeyî
 185. Mişextî / Mela Xelîlê Mişextî
 186. Muftî / 'Ebdullah Muftî Pênciwêni
 187. Mun'imî / -
 188. Muradxan / Muradxan
 189. Mûsa / Şêx Mûsayê Şêxanî
 190. Mustefa / Şêx Mustefayê Sîsî
 191. Muxlis / Mela Ehmedê Nalbend
 192. Muxlis / Xelîlê Resûlê Sincawî
 193. Nacî / Mela 'Ebdusselamê Cizîrî
 194. Nalî / Mela Xidir
 195. Namî / Fehmî Begê Peçarî
 196. Namî / Ehmed Namî
 197. Namî / Mela 'Ebdulkerîmî Muderrîs
 198. Narî / Mela Mihemedê Merîwanî
 199. Nasîx / Nasîxê 'Ebdullahê Heyderî
200. Neclu'l-Ewhedî / Mela Mihemed Nûrî
 201. Nîhanî / Şêx Miheydinê Koyî
 202. Nîşanî / Melayê Cizîrî
 203. Nûrbexşî / Şêx Mehmedûdê Berzencî Hefîd
 204. Nûrî / Şêx Nûreddînê Birîfkanî
 205. Nûrî / Mela Nûrullahê Godışkî
 206. Nûrî / Şêx Nûrî Şêx Salih
 207. Nuseyrî / Mela Nesredînê Zoqî
 208. Perîş / Mela Perîşanê Dînewerî
 209. Pertew / Mustefa Begê Hekarî
 210. Pîremêrd / Hacî Tewfiqê Mehmûd Axa
 211. Qadir / Mîrza Ebdulqadirê Paweyî
 212. Qanî / Mihemedê Şêx Evdilqadirê Dolaşî
 213. Qedrî / Seyîd Qedrî Hasimî
 214. Racî / Mela İbrahîmê Katûnî
 215. Remezan / Remezanê Cizîrî
 216. Remezanê Cizîrî / Remezanê Cizîrî
 217. Remezanê Kurdiķî / Mela Remazanê Ebbasî
 218. Remzî / Mihemed Marifê Mela Resûl
 219. Rencûr / Ebdurehman Begê Sahibqiran
 220. Rencûrî / Mihemedê Yûsif
 221. Rencûrî / Omerê Xalid Begê Şalebekî
 222. Reşpojan / Mela İmadeddin
 223. Riza / Şêx Riza Talebanî
 224. Rûhî / Şêx Evdirehmanê Aqtepî
 225. Sa'î / Şêx Muhyedînê Hêni
 226. Sabirî / Necmedînê Şêx Ebdurehmanê Şorîce
 227. Sadiq / -
 228. Safî / Kak Mistefayê Hîranî Sanî
 229. Salim / Ebdurehman Begê Sahibqiran
 230. Salim / Şêx Selîmê Texteyî
 231. Sanî / Kak 'Ebdullah Kak 'Elî
 232. Se'îd / Şêx Se'îdê Meczûb
 233. Sebrî / Şêx Necmedînê Ebdurehmanê Berzencî
 234. Sebûrî / Mîr Îmadedînê Hekkarî
 235. Sefwet / Mela Mistefayê Dêlêjeyî
 236. Selam / Şêx Selamê Şêx Ehmed
 237. Selîmî / Selîmê Silêman
 238. Selman / Mela Silêmanê Kercewsî (Kurşun)
 239. Serda / Selaheddînê Gimgimî
 240. Sewadî / Harisê Bedlîsî
 241. Sey Yaqo / Seyîd Ye'qûbê Mahîdeşti

242. Seydî / Mihemed Silêmanê
Hewramanî
243. Seyfî / Ebdulletifê Şoşî
244. Seyîd Salih / Mir Miheme Salihê
Ni'metullahî
245. Seyîd / Seyîd Ye'qûbê Mahîdeşti
246. Sîn / Mela Sîraceddinê Xelîlî
247. Sîn û Cîm / Mela Sîraceddinê Xelîlî
248. Sîrac Ataç / Mela Sîraceddinê Xelîlî
249. Sîrac, / Mela Sîraceddinê Xelîlî
250. Sîracê Xelîlî / Mela Sîraceddinê Xelîlî
251. Sîraceddin / Mela Sîraceddinê Xelîlî
252. Siyahpoş / Mihemed Cewad
253. Şaho / Hesenê 'Ebdulqadirê Biyare
254. Shayiq / Hesenê 'Ebdulqadirê Biyare
255. Şeffî' / Mîrza Şeffî' ê Çamerêzî
256. Şemsî / Seyîd Şemseddin Erzen
257. Şewqî / Mela Xelilê Sêrtî
258. Şewqî / Mela Mihemedê Colemêrgiyê
Xanî
259. Şewqî / Salih Zekî Sahibqiran
260. Şewqî / Şêx Ubeydullah
261. Şêx Elî / Elijê Herîrî
262. Şêx Nûrî / Şêx Nûrî Şêx Salih
263. Şeyda / Şêx Ebdulezîzê Bedlîsî
264. Tahir / Baba Tahirê Hemedanî
265. Tahir / Şêx Tahirê Şoşî
266. Tahir / Tahir Begê Caf
267. Temkîn / Kerîm Mehmûdê Kûhsarâ
268. Tîrêj / Naîfê Hesen
269. Waffî / Xelîlê Resûlê Sincawî
270. Weda'î / Weda'î
271. Wefayî / Mîrze Ebdurehîmê Sabraxî
272. Wehbî / Mela 'Ebdulfetah Katibzade
273. Welî Dîwane / -
274. Wîsalî / Mihemedê Şêx Ehmedê
Merdûxî
275. Xadim / 'Ebdullahê M. Mewlûd Koyî
276. Xakî / Mihemedê Helebceyî
277. Xakî / Şêx Mihemed Can
278. Xakî / Şêx Qutbedînê Korikî
279. Xale Mîrza / Xefûrê Hacî 'Umer
280. Xalidê Zêbarî / Şêx Xalidê Zêbariyê
Yekem
281. Xalisî / Mihemedê Şêx Rizayê Talebanî
282. Xana / Xanay Qubadî
283. Xanî / Mihemed Qasim Bayezîdî
284. Xanî / Şêx Ehmedê Xanî
285. Xasî / Mela Ehmedê Xasî
286. Xelatí / Mele Se'id (Seydayê Xelatî)
287. Xelîl Munewwer / Xelîlê Xidrê Kakeyî
288. Xelîl / Xelîlê Xidrê Kakeyî
289. Xelwetî / Şêx Şemseddinê Exlatî
290. Xemgîn / Kerîm Mehmûdê Kûhsarâ
291. Xemkûr / Mihemed Helimê Xursa
Heftêxuhan
292. Xerîbî / Mihemed Teyar Paşa
293. Xerîbî / Mihemed Xerîbê Şoşî
294. Xewsî / -
295. Xeyn û Elîf / Axaokê Bêdarî
296. Xulam / Xulam Riza Erkewazî
297. Xuldî / Mela Xalid Korkusuz
298. Xunûkî / Şêx Muşerrefê Xunûkî
299. Yusrî / Mela Yasînê Şemê
300. Zahir / Mela Zahirê Tendûrekî
301. Ze'îffî / -
302. Zebûnî / Silêman Begê Zengene
303. Zeynî / Seyîd Qedrî Haşimî
304. Zîwer / Mela 'Ebdullahê Mihemed
305. Zuweyhir / Mela Zahirê Tendûrekî

Lîste 2: Mexles Bi Awayeki Alfabetik

4. TAYBETIYÊN MEXLESÊN KU DI EDEBIYATA KURDÎ YA KLASİK DE HATINE BIKARANÎN

4.1. Şêweyên Bikaranîna Mexlesê

Di edebiyata Kurdî de, wek edebiyatê Farisî û Tirkî, em dikarin behsa du dustûrên bingehîn ên bikaranîna mexlesê bikin. Dustûra yekem ew e ku çi ji beytan pêk bêñ (xezel, qesîde, mesnewî) û çi ji bendan pêk bêñ (muselles, murebbe, terkîbbend û hwd.) ferq nake, di hemû teşeyen nezmê de mexles di dawiya helbest/menzûmeyê de tê bikaranîn. Dustûra duyem jî ew e ku bikaranîna mexlesê bi piranî carek e. Digel van dustûrên bingehîn, divê bê gotin ku di edebiyata Kurdî de bikaranînêñ cuda ên mexlesê jî têñ dîtin ku ev yek di edebiyatê dî yêñ Islamî de jî wisa ye (Bo nimûne ji bo bikaranînêñ cuda ên mexlesê edebiyata Tirkî ya klasîk bnr. Kayaokay, 2017).

Bêguman di vê gotara destpêkî de mecal tuneye ku di çarçoveya tevahiya edebiyata Kurdî de hemû bikaranînêñ mexlesê bêñ tesbîtkirin. Aşkera ye ku ji bo vê yekê divê gelek xebatê spesîfik bêñ kirin. Lîbelê em dixwazin li vê derê di çarçoveya edebiyata Kurmancî de bi awayekî gişî û kategorîk li şêweyên bikaranînêñ mexlesê binêrin.

4.1.1. Helbestêñ ku ji Beytan Pêk Têñ

Eger em bi qesîde û xezelan dest pê bikin ku helbestêñ yekserwa ne û bi beytan têñ nivîsin, em dibînin ku di vê kategoriyê de di çarçoveya standartê de mexles di beyta herî dawî (meqte'), yan jî di beyta berî wê de hatiye bikaranîn. Lîbelê hin helbestvanan carinan mexlesê xwe berî beyta meqte'ê bi çend beytan jî bi kar anîne (bi piranî ji dawî ve di beyta sêyem, yan jî di beyta çarem de). Ev şêwaz, di edebiyata Farisî de jî tê dîtin. Di vê rewşê de beyt, yan beytêñ peyrew wek temamkerê beyta mexlesê têñ qebûlkirin (Fesaî, 1373, r. 567). Ev helbesta jêrîn a Melayê Cizîrî wek nimûneyeke kevin a vê şêweyê derdikeve pêş:

Ji Melayê Cizîrî

1. Me lew fincan li ser dest e ku mehtaba hilal ebrû
Numayin min di mir>atê meya safâ zelal ebrû

...

12 Eger de'wayê Mûsayî di 'işqê da bikim ca'iz
Mela daîm tecella ye ji wê terha şelal ebrû

13 Bi şîrînî bi zîbayî çi katib bû we kêşayî
Te'alallah nîşan dane we şîrîn ev mîsal ebrû

14 Ne Şîrîna li Derbendê ne mehbûbê Semerqendê
Nekêşayin bi vî rengê li neqşê bêzewal ebrû

15 Nişana qabê qewseynî ku qews avête ebsaran
Di teqwîma tecellayî bi ser lê bûn hilal ebrû
(Melayê Cizîrî, 2010, r. 203-204)

Çawa tê dîtin, Melayê Cizîrî mexlesa xwe ji dawiyê ve di beyta çarem de bi kar anije. Lîbelê li cem Mela ev bikaranîn ne zêde berbelav e. Bi qasî ku tê dîtin, di nav helbestvanên klasîk ên edebiyata Kurmancî de, Şêx Ehmedê Feqîr nûnerekî xurt ê vê şêwazê ye. Şêx Ehmedê Feqîr di gelek xezel/qesîdeyên xwe de mexlesa xwe (Ehmed) ne di beyta dawiyê de, berî wê bi çend beytan bi kar anije. Di nimûneya jêrîn de Şêx Ehmedê Feqîr, wek xezela jorîn a Melayê Cizîrî, ji dawiyê ve di beyta çarem de cih daye mexlesa xwe û wek şêwaza edebiyata Farisi, ji beyta mexlesê pê ve heta bi dawiya helbestê mijara bingehîn a helbestê ku evîn e, guherandiye û ev bes ji bo duayê terxan kiriye.

1. Dilberê dil daye bi derb û cerah
Dil kire mecrûhê bi tîr û rimah
2. Xal û xet û zilfîn siyahê di hûr
Dil dane zewq û ferehê'b işşirah
3. Ku me li te terkî ne ya bûtperes
Lat û 'uzza bûn ji te ew musterah
4. Min ku kir e quesda tewafa hebîb
Bismî İlahî'l-'erşî min iftitah
5. Daye icaze ji me ra dilberê
Bê me tewafa gerdenê'b iqtirah
6. Pûşide em çîçekê şemşîr û tîr
Xencer û tîxa ce'ferî hem rimah
7. Ma qet îcaze neda 'eynî hedîs
Metnê mesabîhê hisan û sehah
8. Şerhu'l-'ubab û menhec û rewdeyê
Îbnu'l-Hecer hate bi uznê semah

9. Ku me li te destûr e ya dil bi rîş
Tu here bostanê bi xox û tufah
10. Ewwel tu tecdîdê û wudû'ê begîr
Ji zemzem û abê heyatê reşah
11. Ber hecerî cubbe de ber istilam
Se'yî û wuquf da ku bîbit musterah
12. Paşê bibeste ji xwe ra ba edeb
Der gulşen û bustanê 'eqda nikah
13. Tu bimêje nûr û nesîma ji mûnîr
Dûr û be'îd e ji zinaê û sefah
14. Bade vexwe qerqef û kasê xumûr
Meyxur û mestane dibî hat û rah
15. **Ehmed** ku bedhal e ji şewqa hebîb
Lew ku dikit gazî û xews û siyah
16. Hêvî rica bê nezera şah ê dil
Da'î ji te her bi mesa û sebah
17. Hifz û 'inayet ji te bê ya hebîb
Hamî ez zumari bi esbah û rewah
18. Hêvî ji te ya Rebbî ya seyîdî!
Nusret û fethê tu bide ya Fettah (Acar, 2016, r. 253-254)

Melayê Cizîrî di helbesta xwe ya jêrîn de, bi du mexlesên xwe yên cuda serî li vê şewazê daye. Çawa tê dîtin Mela ji dawiyê ve di beyta sêyem de du mexlesên xwe (Mela, Nîşanî) bi hevre bi kar anîne:

Ji Melayê Cizîrî

1. Lillahilhemd ji yarê me di dest came lebaleb
Ji lebê noşî peyapey di dil îlham e lebaleb
...
- 8 Carekî gohtî **Nîşanî**, ne **Mela** yî were banî
Ev dixwest me ji dil û can dihen û kame lebaleb

9 Te dizanim te dibînim ku tu wî nûrê wucûd
 Allah Allah ji çi nûr e di seraya me lebaleb

10 Ji 'înayet nezerê xas e ku her misre' û beytek
 Qedehê abê heyatê ne di şî'ra me lebaleb (Melayê Cizîrî, 2010, r. 33-34)

Carinan helbestvanan mexlesên xwe di du beytên cuda de bi kar anîne. Di vê rewşê de bi piranî yek ji wan di beyta meqte'ê (beyta herî dawî) de, ya dî ji çend beyt berî wê hatiye bikaranîn. Di vê rewşê de dibe ku di her du beytên cuda de heman mexles hatibe bikaranîn û dibe ku du mexlesên cuda hatibin bikaranîn. Li jêrê emê li ser du nimûneyên cuda vê yekê pratîze bikin:

Nimûne 1:

Ji Melayê Cizîrî:

1. Destê qudret ku hilavêti ji bejna te nîqab
 Bi cemala ceberûtî me neman perde'w hîcab

...

9 Bi hebabê mebe mexrûr wehe sergeşte **Mela**
 Ba vi ber keftiye wê beyhûde sergeşte hebab

10 We ye hudhud ji Seba bêt û bizanîn çi ye hal
 Ku li halê me xerîban ne sual û ne cewab

11 Herdu birhêne te ne mihrab çi îman û çi kufr
 Bûd û nabûd ku yek in ev çi sewab û çi 'îqab

12 Were nîşanî **Nîşanî** de xwe bê perde seher
 Lê ji xûnê bike perhîz ku şehîdan çi hisab
 (Melayê Cizîrî, 2010, r. 31-32)

Çawa tê dîtin, di vê nimûneyê de Melayê Cizîrî, bi du mexlesên xwe yêن cuda serî li vê şêwazê daye. Mexlesek ji wan (Nîşanî) di beyta meqte'ê de, mexlesa dî ji (Mela) sê beyt berî wê hatiye bikaranîn.

Nimûne 2:

Ji Seyîd Qedriyê Cizîrî

1 Ah û nalên dil ji kû têñ ma çi zanin bu'l-hewes
 Waqifê esrarê Heq zanin bi nalînêñ ceres

2 Der serayê xelwet im şahim heqîqet nist(i) xeyr
 Ez cunganem cuz ruwî wey qet nemîmeylem bi kes

- 3 'Ûd û tenbûr berkevem dilber muqabil hate reqs
Ber tu ey dil seyr(i) kun ev reqs û ev awaz(i) bes
- 4 **Qedriya** dil wadiyê Eymen çira ye lew me seyr
Nûrê nûr der şûşeyê can dî bi ummîdê qebes
- 5 Dest be dest yara şirîn em der sefer bazan û seyr
Her du bazî per dibin emma bi awaz û hewes
- 6 Wek Şirîn nezmê te dil-ara û lu'lû kes nedî
Tali'ê şî'ra me da ez himmetê 'Îsa-nefes
- 7 Sebr eger bînî li deryayê kerem da bête coş
Ez Husameddin teleb kon **Qedriya** canane res (Hasimî, 2016, r. 67)

Di vê nimûneyê de jî Seyîd Qedriyê Cizîrî, wek nimûneya jorîn a Melayê Cizîrî, mexlesên xwe di beyta meqte'ê de û ji dawiyê ve di beyta çarem de bi kar anîne. Lîbelê Seyîd Qedrî ne du mexlesên cuda, di her du beytan de jî heman mexles bi kar anîye.

Nimûneyên wê kêm bin jî, di dawiya xezel/qesîdeyên müşterek (hevpar) de jî du mexles cih digirin. Di vê rewşê de du helbestvan bi hev re helbestekê dinivîsin, her du jî di dawiya helbestê de mexlesên xwe bi kar tînin û bi vî awayî di dawiya helbestê de du mexles kom dibin. Di nimûneya jêrîn de Şêx Ebdurehmanê Aqtepî (Rûhî), Şêx Mihemed Kerbelayî (Kerbelayî) û Şêx Eskerî (Eskerî) xezeleke hevpar nivîsîne. Li gor agahiyênu ku 'Eskerî dane, di vê xezelê de beyta metle'ê ya Rûhî ye, beytên dî yên xezelê jî ji aliyê wî û Kerbelaî ve bi hevparî hatine nivîsîn ('Eskerî, 1412, r. 51). Ji ber vê yekê jî di helbestê de her du helbestvanan jî mexlesên xwe bi kar anîne:

Jî Rûhî, Kerbelaî û 'Eskerî

1. Du ta sosin du ta ceh min girêdabû di nav hev de
Eger çarê dî jî hebwa bi tehqîq ew dibû qevde } Rûhî
2. Heme alem lebaleb sosin û nesrîn û gulnar in
Ne ku sosin tune ya ceh welê kes nîne ber hev de } Kerbelaî
3. Ji tayê sosin û ceh min xered behs e ji ewsafan
Weger ne ev nimûne maye bo me her di nîv dev de } Eskerî

4. Were saqî ji bo me lutf(i) ke hin badeê rengîn
Ji himmet bîne xîret deste çê kin em hemî tev de } Kerbelâî
5. Gelî yaran werin em biç'ne seyra çîçekên narîn
Berevkin deste deste nergis û sosin di nav hev de } Eskerî
6. Şemalek hilbitin bo me ji cem'a terh û bişkojan
Wekî perwane perwaz(i) bidin dûdî di nêv şev de } Kerbelâî
7. Te'alellah ji sen'etxaneê qudret bi vî terzî
Biçe ew zulf û gîsû û bi sosin ew zeban dev de } Eskerî
8. Tu zulf û kakil û gîsû û perçem ruwwê gulnûrîn
Zuhûr ke da li reyhan û gulan û sunbulan rev de } Kerbelâî
9. Ewî qam û qedê pur sunbul û gul sosin û reyhan
Hela carek tu nîşan de kí ye jê re nebit 'evd e } Eskerî
10. Bibêje **Kerbelayî** van cuwanterhan ji kû tînî
Eger ne xalîqê purqudretê ruhperwer ew ev de } Kerbelâî
11. Eger ne **Eskerî** şewqa gul û reyhanê dilber bit
Ki yê ceh gendim û sosin weha hinde ku tev hev de } Eskerî
(‘Eskerî, 1412, r. 51-52.)

Çawa ku li jorê di nimûneya yekem de jî hat dîtin, helbestvanê dumexles jî, carinan di dawiya xezel/qesîdeyê de du mexlesan bi hev re bi kar tînin. Ji ber vê jî dema em di dawiya xezel/qesîdeyekê de du mexlesên cuda bibînin, dibe ku ew her du mexles du mexlesên cuda yêñ helbestvanekî bin û dibe ku her yek ji wan ya helbestvanekî cuda be. Ji ber hebûna van her du ihtîmalan, divê di helbestên bi vî rengî de em bi baldarî tevbigerin û pêşî xwediyêñ wan mexlesan tesbît bikin. Piştî ku em ji xwediyêñ wan ewle bûn, em êdî dikarin biryara xwe bidin ka ew helbest ji aliyê helbestvanekî ve, yan jî ji aliyê du helbestvanan ve hatiye nivîsîn. Dema em di çarçoveya nimûneya jorîn de li mijarê binêrin, di vê biwarê de tu arîse tuneye. Lewra em wek zanyariyeke tarîxa edebiyata Kurdî dizanîn ku mexlesên Kerbelâî û ‘Eskerî ji aliyê du kesayetên cuda ve hatine bikaranîn û hevpariya vê helbestê rasterast ji aliyê yekî ji van helbestvanan (Eskerî) ve hatiye ragihandin.

Di xezel/qesîdeyêñ Kurdiya Kurmancî de, digel dawiya helbestê di beyta metle' de jî mexles hatiye bikaranîn. Di vê rewşê de digel xilaskirina helbestê,

destpêkirina wê jî bi mexlesê çê dibe. Çawa ku di nimûneyên jêrîn ên Mela de tê dîtin, dibe ku di destpêkê û dawiyê de heman mexles bê bikaranîn û dibe ku du mexlesên cuda jî bêñ bikaranîn.

Nimûne 1:

Ji Melayê Cizîrî

1. Ahî ji destê wê sirê dil ji meyê hewale kir
Her çi li min kirî **Mela** camê meya du sale kir
...
- 8 Xunçeleba ji renggulê dêmê bi sir numa **Melê**
Şubhetê bulbulan seher lew me fixan û nale kir (Melayê Cizîrî, b.n., r. 91)

Nimûne 2:

Ji Melayê Cizîrî

1. Îro **Mela** serapa lew têki bûme ateş
Min dî seher xeraman neysekkera şirînmes
...
2. Birhêni ji qewsê qudret nîşane kir **Nişanî**
Lami' ji ber dibarin ci yengiyek we perweş
3. Allah li min hubba te ci sekker û nebat e
Ji nû ve dê ciwan bim ger bîhn bikim gula ges
(Melayê Cizîrî, b.n., r. 110-11)

Mela di her du nimûneyan de jî, mexlesa xwe hem di destpêkê de, hem jî di dawiyê de bi kar aniye. Lîbelê di şêweya bikaranînê de cudahî heye. Di nimûneya yekem de Mela hem di beyta metle'ê (beyta yekem) de, hem jî di beyta meqte'ê (beyta dawiyê) de, mexles bi kar aniye û di her duyan de cih daye heman mexlesa xwe (Mela). Lîbelê di nimûneya duyem de Mela, mexlesa xwe ya dawiya helbestê ne di beyta meqte'ê de, di beyta berî wê de bi kar aniye. Dîsa di vê nimûneyê de her du mexlesên Mela ji hev cuda ne. Di beyta metle'ê de mexlesa wî ya bi şêweya "Mela" û di beyta berî meqte'ê de jî mexlesa wî ya bi şêweya "Nişanî" cih digire.

Di xezela jêrîn a Melayê Cizîrî de bikaranîneke taybet a mexlesê heye. Lewra di vê xezelê de Melayê Cizîrî, mexlesa xwe (Mela) xistiye nav paşserwaya helbestê ku di dawiya misrayê duyem ên hemû beytan û misraya yekem a beyta yekem de hatiye bikaranîn. Ji bilî paşserwayê, mexlesa "Mela" li cihekî dî yê helbestê nehatiye bikaranîn. Di encamê de di hemû beytên xezelê de heman mexles hatiye bikaranîn. Di vê rewşê de bi qasî jimara beytên xezelê mexlesxane (beyta mexlesê)

çê dixin ku ev şêwazeke gelekî balkêş e. Ev şêwaza balkêş (bikaranîna mexlesê wek redîfa xezelê) di edebiyata Tirkî ya klasîk de jî tê dîtin ku cara pêşî di sedsala XVem de ji aliyê Cem Sultan ve hatiye bikaranîn. (Kayaokay, 2017, r. 150). Melayê Cizîrî jî, bi ihaftimaleke mezin bêyî ku haya wî ji Cem Sultan hebe, di sedsala XVI-em de serî li vê şêwazê daye û di çarçoveya agahiyên berdest de di edebiyata Kurdî de wek nûnerê yekem ê vê şêwazê dikare bê nirxandin.

Ji Melayê Cizîrî

1. Îro ji derba xencerê lazim bi êşan î **Mela**
Teşbîhê zulfa dilberê zanim perîşan î **Mela**
2. Zanim perîşan î ji dil bê hed bi êşan î ji dil
Teşbîhê buryan î ji dil billah ne insan î **Mela**
3. Billah ci teb'etadem î yekser dibêm yek 'alem î
Deryayê Qaf û Qulzem î yan çerxê gerdan î **Mela**
4. Ya Reb ci wê mihnetkeş î ser ta qedem têk ateş î
Mecrûhê qewsê tûzreş î lew dil bi peykan î **Mela**
5. Zanim ji 'isqê dojeh î behrek ji narê asih î
Îro li mahê xergeh î teşbîhê seywan î **Mela**
6. Ev sîneya wek nay û ney pur lê kişandin dax û key
Hê dil bi naehlan didey ya Reb ci nadan î **Mela**
7. Durdaneya dêmgewher e ayîneya Eskender e
Bêmirwetê dil kir ker e mecrûhê xalan î **Mela**
8. Bêmirwetê dil herişand teşbîhê şîşê lê kişand
Ker kir ceger xwoy lê reşand ateş li ser danî **Mela**
9. Narê ji rengê dojehê husn û cemala wê mehê
Me d'perdeya vê xergehê xef kir ci <umman î **Mela**
10. Îro li 'umrê xwo'y telef bê şahid û cama sedef
Bê çeng û saz û nay û def zanim peşîman î **Mela**
11. Zanim te kohê Tûr e dil lew her bi nar û nûr e dil
Şehkaseya ferfûr e dil lew mest û sekran î **Mela**

12. Her sîne tabê natemam napuxte xam bê mihr û cam
 Xerqîn di xûna dil medam le>la Bedexşan î **Mela**
13. Pur le'l û dur te j'kilkê 'işq anîne nezma silkê 'işq
 Der berr û behrê mulkê <işq me>lûm e xaqan î **Mela**
14. Bê hed li qelbê şubhê ney cewra te danîn dax û key
 Lew bê hemel xwoş nîne mey emma bi şîranî **Mela**
15. Minnet ji tali' her ji bext Asif bi text û bext û rext
 Belqis ewî anî bi wext îro Suleyman î **Mela**
16. Ew herdu le'l û herdu weşm geh geh bi naz û geh bi xeşm
 Ew bejn û bala hate çeşm me d'seyrê rûhanî **Mela**
 (Melayê Cizîrî, r. 216-217)

Heta bi vê derê, me di çarçoveya çend nimûneyan de û hin şêweyên bikaranîna mexlesê di xezel/qesîdeyên Kurmancî de pêşkêş kir ku ev şêwe weha dikarin bêñ xulasekirin: Di beyta herî dawî de, di beyta berî wê de, ji dawiyê ve di beyta sêyem yan jî çarem de, di nîvekê de, du mexles di beytekê de, du mexles di du beytêñ dawiyê de, du mexles di beyta pêşî û dawiya helbestê de, du mexlesê du helbestvanan di dawiyê de û di hemû beytan de. Çawa ku tê dîtin gelek şêweyên bikaranîna mexlesê di xezel û quesîdeyê de hene. Ev bikaranînen mexlesê di cihêñ cuda de û bi şêweyên cuda li gor xwestina nazim û helbestvan çê dibe. Lêbelê divê bê gotin ku bikaranîna mexlesê di dawiyê de bikaranîna bingehîn û ya herî berbelav e.

4.1.2. Helbestêñ ku ji Bendan Pêk Têñ

Di helbestêñ ku ji bendan pêk têñ de, ku em wan wek musemmet (muselles, murebbe', muxemmes, terbî, texmîs, tesdîs û hwd) û murekkeb (terkîbbend û tercî'bend) li ser du beşan dabeş dikin, cihê bikaranîna mexlesê dawiya helbestê (bi piranî benda dawî) ye. Di vê yekê de helbestêñ ku ji beytan pêk têñ û yên ku ji bendan pêk têñ wek hev in. Lêbelê di beşek ji musemmetan de (musemmetên tezmîn: terbî, texmîs, tesdîs) rewşeke taybet a mexlesê heye ku ev rewş di beşa dî ya musemmetan (musemmetên bingehîn ên wek murebbe', muxemmes û hwd.) û helbestêñ murekkeb de nayê dîtin. Loma divê bi taybetî behsa wê bê kirin. Çawa tê zanîn di helbestêñ ku dikevin kategoriya musemmetên tezmîn de yek kevin û yek nû du xwediyêñ helbestê hene û helbestvanê nû hin beytêñ xwe li ser beytêñ helbestvanê kevin zêde dike. Di vê rewşê de, ji ber ku her du jî xwedî mexles in di dawiya helbestê de (bi piranî di benda dawiyê de) du mexles kom dibin. Loma

em dikarin bibêjin ku di musemmetên bingehîn û terkîbbend û tercî'bendan de di benda dawiyê de tenê mexlesek cih digire, lêbelê di musemmetên tezmîn de du mexles bi hev re cih digirin. Kombûna du mexlesan tê wê wateyê ku ew helbesta dumexlesî ji aliyê du helbestvanan ve hatiye nivîsin. Li jêrê terbi'a Şêx Nûredînê Birîfkanî ku li ser xezeleke Melayê Cizîrî nivîsiye cih digire. Di her bendeke vê terbî'ê de du beyt cih digirin ku yên yekem ên Birîfkanî ne û yên duyem jî yên Melayê Cizîrî ne. Ji ber vê jî di benda dawiyê de hem mexlesa Birîfkanî hem jî ya Cizîrî bi hevre cih digirin.

Nimûne:

Terbi'a Şêx Nûredînê Birîfkanî li ser xezeleke Melayê Cizîrî

- 1 Kafî min ji dilberê her mujdeyê hîmayet
 Yek nameyê zerfişan mektûbetê wîlayet
 (Ewwel ku yarê da me yek zerreyek 'înayet)
 (Qismet me xemr û cam e di deftera hîdayet)
- ...
- 11 Nûrî ji dil tu şâ i her çendî pir belâî } Şêx Nûredînê Birîfkanî
 Dilbend û mehweşa i lew dîn û mubtela î }
 (Mîrî û padişahî müyek li nik **Melayî**) } Melayê Cizîrî
 (Nadim bi mulkê 'alem yek zerreyek 'înayet) }
- (Birîfkanî, 2002, r. 258-260)

4.1.3. Berhemên Serbixwe

Di menzûmeyên dirêj ên ku bi teşeya mesnewiyê û bi şêweya berhemên serbixwe hatine nivîsin de jî dustûra bingehîn ew e ku mexles di dawiya berhemê de bê bikaranîn. Lêbelê hin nazim û mesnewînûs carinan di nav berhemê de jî mexlesên xwe bi kar tînin. Di vê rewşê de jimara mexlesê û cihê bikaranîna wê li gor daxwaza helbestvan diguhere. Bo nimûne Ehmedê Xanî di heşt besên *Mem û Zînê* de (beş 1, 2, 3, 41, 45, 55, 58 û 60) mexlesa xwe (Xanî) 9 caran bi kar anije (Xanî, 2009). Di berhemên serbixwe de jî hin şêweyên cuda û taybet ên bikaranîna mexlesê têr dîtin. Bo nimûne Şêx Ebdurehmanê Aqtepî di dawiya hemû besên *Rewdu'n-Ne'îmê* de cih daye mexlesa xwe (Rûhî). Di eslê xwe de ji ber ku Aqtepî berhema xwe li gor sîstema tercî'bendê nivîsiye, di dawiya hemû bendan de bi mentiqa beyta wasite/navbendê beyta jêrîn dubare kiriye:

İlahî tu **Rûhî** nekî şerm(i)sar
 Ker û lal û gêj e tunîne medar (Aqtepî 2011)

Çawa tê dîtin Aqtepî di vê beytê de cih daye mexlesa xwe jî. Bi vî awayî di dawiya hemû besan de mexlesa wî tê dubarekîrin.

4.2. Mexles ji Aliyê Morfolojîk ve

Ji aliyê morfolojîk ve mexles li ser du şêweyên bingehîn dikare bê dabeşkin. Di şêweya yekem de di dawiya mexlesan de paşgira û yê cih digire ku wek û ya nisbetê tê binavkirin. Di vê şêweyê de helbestvan xwe nisbetî tiştekî dike. Mexlesen ku û ya nisbetê werdigirin çend şêweyên wê hene:

1. “î”ya nisbetê carinan tê dawiya navan: Bo nimûne Selîm bûye “Selîmî”, nîşan bûye “Nîşanî”, Bate bûye “Bateyî” û Hesîb digel guherîneke hundurîn bûye “Hesbî”.
2. “î”ya nisbetê carinan tê dawiya sifetan. Bo nimûne ze’îf bûye “Ze’îfî”.
3. “î”ya nisbetê carinan tê dawiya forma tesxîrê, yanî forma biçükkirinê ya navan. Bo nimûne “Nuseyr” tesxîra Nesredîn e ku tê wateya Nesredînê biçûk. Mela Nesredînê Zoqî, di mexlesa xwe de “î”ya nisbetê aniye dawiyê tesxîra navê xwe.

Şêweya duyem jî ew e ku mexles bêyî “î”ya nisbetê bêñ sazkarin. Ev jî çend şêweyên wê hene:

1. Mexles carinan navêñ helbestvan ên xwerû û rasteqîn bixwe ye. Wek Ehmed, Elî û Riza.
2. Mexles carinan hin herfîn elîfbîya Kurdi-’Erebî ne ku di navê helbestvan de cih digirin. Wek mexlesa Feqiyê Teyran “Mîm û Hê” ku ji her du herfîn pêşî yên navê wî Mihemed hatiye wergirtin.
3. Mexles carinan hevalnavêñ xwerû ne. Wek Laxer (kesê lawaz), Salim (kesê nenexwêş)
4. Mexles carinan hevalnavêñ hevedudanî ne. Wek Siyahpoş (siyah + poş: kesê ku reş li xwe dike), Durefşan (dur + efşan: kesê ku duran belav dike), Cegerxwîn û Reşpoşan.

4.3. Pêwendîya Mexlesê bi Kêşê re

Ji ber ku helbesten klasîk bi kêşa erûzê têñ nivîsîn, mexles jî dibin beşek ji pêkhateyên qalibên erûzê û bivênevê pêwendîya mexlesê bi kêşa erûzê re çê dibe. Helbestvan wek hemû peyvan, mexlesê jî li gor hêcayêñ kurt û dirêj ên tef'ileyan bi kar tînin. Li gor lêkolînêñ ku hatine kirin, mexlesen edebiyata Farisi, bi mebessta ku bi qalibên kêşê yên helbesta Farisi re biguncin, bi awayekî ku bi tef'ileyan berbelav ên wek “fe'lun” (Hafiz), “fe'ûlun” (Senaî), “fe'ûl” (Kelîm), “mef'ûlun” (Firdewsî) û “fa'ilun” (Aferîn) re bikevin nav hevsengiyê hatine hilbijartin (Şerîfî, b.n., r. 397). Ev jî tê wê wateyê ku di neqandina mexlesan de rîtma helbestê jî li ber çavan hatiye girtin. Helbestvan li gor meyl û şêwaza xwe ya di rîtm û ahengê de jimara hêcayêñ mexlesê û nirxêñ wan ên kurt û dirêj tesbît dikin û bi vî awayî di mexlesekê de qerar digirin. Dema em ji vê perspektîfî li mexlesen edebiyata

Kurdî dinêrin, ji aliyê hevsengiya tef'ileyên erûzê û mexlesên edebiyata Kurdî ve encameke weha derdikeve meydanê:

Fe'lun: Xanî, Miksî, Laxer, Nalî, Mehwî, Kurdî, Xakî, Rûhî, Nûrî, Xuldî, Fethî, Qedri, Hesbî, Hacî, Ehmed, Salim, Bîmar, Rencûr, Dahî, Yusîrî, Namî, Seyfî, Sa'î, Bedrî, Şewqî, Lami', Pertew.

Fa'ilun: Xelwetî, Bateyî, Eskerî, Bê û Kaf, Mîm û Hê.

Fe'ûlun: Selîmî, Sebûrî, Sewadî, Xerîbî, Weda'î, Siyahpoş, Wefayî, Xunûkî, Nuseyrî, Bureyha, Bureyhîm, Cegerxwîn.

Fe'ûl: Mela, Feqî, Riza, Se'îd, Herîq, Hezîn, 'Elî.

Fa'ilatun: Kerbelayî.

Di çarçoveya van daneyan de dikare bê gotin ku mexlesên ku di edebiyata Kurdî de hatine bikaranîn, bi tef'ileyên bingehîn ên qalibên remel (fa'ilun, fa'ilatun) û serî'ê (fe'ûlun, fe'ûl) re diguncin. Lêbelê dibe ku mexles di navbera du tef'ileyan de bê parçekirin, yan jî digel hêcâyên hin peyvîn dî re tef'ileyê saz bike.

Eger tef'ileyên Farisî û Kurdî bêñ berawirdkirin, dê bê dîtin ku tef'ileya "mef'ûlun" ku di mexlesên Farisî de hatiye bikaranîn di mexlesên Kurdî de nehatiye bikaranîn. Ev yek di kêsên ruba'iyê de jî hatiye çavdêrîkirin. Li gor tesbîta Gerdî, qalibên koma exremê ku bi "mef'ûlun" dest pê dikin, di ruba'iyên Farisî de hatine bikaranîn, lêbelê di yên Kurdî de nehatine bikaranîn. Sebebê vê jî ew e ku helbestvanên Kurd tef'ileya "mef'ûlun" ji ber giraniya wê, di helbesta Kurdî de bi kar neanîne û li şûna wê forma wê ya sivik (mef'ûlu) tercîh kirine (Gerdî, 1999, r. 629).

4.4. Mexles Ji Aliyê Wateyê ve

Çawa ku di destpêkê de jî hatibû gotin, helbestvan bi rîya mexlesên xwe taybetiyê xwe yên ku dixwazin aşkera bibin derdixin pêş. Bi rastî jîji her mexlesekê mesajek dikare bê wergirtin ku bi wê mesajê aliyekî kesayetiya helbestvan yan jî taybetiyeke wî aşkera bibe. Ji ber vê jî wateyên mexlesan ku helbestvan bi rîya wê mesajan didin xwinerên xwe girîngiyê bi dest dixin. Derxistina profila wateyên mexlesan ji bo tesbîtkirina çanda helbestvanan jî dê bibe nîşaneyeke girîng ku li ser wê gelek şirove û analîz dikarin bêñ kirin.

Helbestvanên Kurd bi rîya mexlesê di qadêñ curbicur de mesajên curbicur dane. Gelek caran navên xwe û zanyariyêñ nasnameya xwe (eşîr, dever, gund, pîşe, terîqet) wek mexles bi kar anîne û ev aliyêñ xwe derxistine pêş. Gelek mesajen ku di mexlesan de cih digirin jî bi aliyê derûnî yê helbestvanan ve girêdayî ne. Helbestvanan di vê çarçoveyê de carinan xemgîniya xwe, carinan kêfxweşıya xwe, carinan jî mîzac û rewşa xwe derxistine pêş. Emê li jêrê mexlesên edebiyata Kurdî ya klasîk ên ku di vê xebatê de hatine tesbîtkirin bi awayekî tematîk dabeş bikin û piştre daneyên ku bêñ bidestxistin bi kurtî analîz bikin.

1. Zanyariyê Nasnameyê

1.1. Nav

1.1.1 Navê Xwerû

1. Baba Tahirê Hemedanî: Tahir
2. Şêx Mûsayê Şêxanî: Mûsa
3. Mela 'Eliyê Botî: 'Elî
4. Mihemed Xerîbê Şoşî: Xerîbî
5. Şêx Tahirê Şoşî: Tahir
6. Şêx Ehmed Hilmî: Ehmed
7. Seydayê Mela Husnî: Husnî
8. Şêx Muhemed Hadiyê Qewmanî: Hadî
9. Şêx Mustefayê Sîsî: Mustefa
10. Şêx Evdilqadirê Xanî: **Evdilqadirê Xanî**
11. Hesen Mîrza Qasimê Qazî: Hesen
12. Mela 'Arifê Dêrsilavî: 'Arif
13. Ehmedê Derwêş/Exol: Ehmed
14. Nasixê 'Ebdullahê Heyderî: Nasix
15. Mela Perîşanê Dînewerî: Perîşan
16. Şêx Nûrî Şêx Salih: Nûrî, Şêx Nûrî
17. Mir Miheme Salihê Ni'metullahî:
Seyid Salih
18. Tahir Begê Caf: Tahir
19. Mihemed Emînê Şinoyî: Emîn
20. Fehmî Begê Peçarî: Fehmî
21. Xelîlê Xidrê Kakeyî: Xelîl, Xelîl
Munewwer, Mihemed Xelîl,
Mela Xelîl, Mîrza Xelîl,
22. Melayê Cizîrî: Ehmed
23. Lutfiyê Şêx Rizayê Qûle: Lutfî
24. Kamilê 'Ebdulhekîmê Zenbîlî: Kamil
25. Ehmed Muxtar Caf: Ehmed
26. Şêx Ehmedê Feqîr: Ehmed
27. Melah Ehmedê Heyderî: Ehmed
28. Ehmed Begê Komâsî: Ehmed
29. Mela Ehmedê Nalbend: Ehmed
30. Mela Ehmedê Zinarexî: Ehmed
31. Mela Ehmedê Xelaftî: Ehmed
32. Mîrza Ebdulqadirê Paweyî: Qadir
33. Ebdulqadir ïnan: Ebdulqadir
34. Şêx Selamê Şêx Ehmed: Selam
35. Emîn Axayê Bekir Axayê Koyî: Emîn
36. Mîrza Şeffî'ê Çamerêzî: Şeffî'
37. Mela Mensûrê Girgaşî: Mensûr
38. Şêx Ebdulezîzê Bedlîsî: 'Ebdul'ezîz
39. Miradhanê Bazîdî: Muradhan
40. Şêx Mihamed Eskerî: Eskerî

41. Şêx Ebdulqadirê Hezanî: Ebdulqadir,
Ebdulqedîr
42. Hacî Qadirê Koyî: Hacî
43. 'Elî Beg Salar Se'îd Heyderî: 'Elî
44. Şêx Se'îdê Meczûb: Se'îd
45. Şêx Riza Talebanî: Riza
46. Seyîd Eliyê Findikî: 'Elî
47. Mela 'Eliyê Baqstanî: 'Elî
48. Xefûrê Hacî 'Umer: Mîrza, Xale Mîrza,
Mîrza Xefûr
49. Xanay Qubadî: Xana
50. Mela Sîraceddinê Xelîlî: Sîrac,
Sîraceddin
51. Eliyê Herînî: Elî
52. Remezanê Cizîrî: Remezan
53. Mela 'Ebdullahê Kotaliyê: 'Ebdullah
54. Şêx 'Ebdurehmanê Şawîrî:
'Ebdurehman
55. Şêx Mihamed Emînê Heyderî: Emîn,
Emînê Heyderî, Heyderîzade Emîn.
56. Mela Mihamedê Hezanî: **Mihamedê**
Hezanî

1.1.2. Nav bi teşeya nisbetê

1. Selîmê Silêman: Selîmî
2. Şêx Mihamed Kerbelâ: Kerbelayî
3. Şêx Hesîb: Hesbî
4. Seyîd Qedrî Haşimî: Qedrî
5. Seydayê Hacî Fetahê Hezroyî: Fethî
6. Mela Xalid Korkusuz: Xuldî
7. Şêx Nûreddînê Birîfkanî: Nûrî
8. Mela Nûrullahê Godişkî: Nûrî
9. 'Arifê Şêx Mehmûdê Qazî: 'Urfî

1.1.3. Nav bi teşeya tesxîrê

1. Mela Nesredînê Zoqî: Nuseyrî
2. Mela İbrahîmê Çoqreşî: Bureyha
3. Mela İbrahim Paresî: Bureyhîm

1.1.4. Nav bi formeke cûda

1. Mela Ebdurrehmanê Melekendî: 'Abidê
Rehman
2. Mela Silêmanê Kercewsî (Kurşun):
Selman
3. Seyîd Şemseddîn Erzen: Şemsî

4. Şêx 'İsmetullahê Karazî: 'İsmet
5. Fehmî Begê Peçarî: Fehîm

1.1.5. Nav bi herfan

- 1- Feqiyê Teyran: Mîm û Hê
- 2- Axaokê Bêdarî: Xeyn û Elîf
- 3- Bekir Begê Erizî: Bê û Kaf
- 4- Mela Mihemedê Hezanî: Mem
- 5- Mela 'Elyî Baqustanî: 'Elî, 'Eyn û lam û ya
- 6- Mihemed Mewlûdê Sabraxî: Mem
- 7- Mela Mihemedê Hezanî: Mîm

1.2. Bav

1. Remezanê Cizîrî: Îbn Dewdan
2. Şêx Mihemed Emînê Heyderî: Heyderîzade, Heyderîzade Emîn

1.3. Dever

1. Feqiyê Teyran: Miksî
2. Şêx Ehmedê Xanî: Xanî (hoz)
3. Mihemedê Qasimê Bayezîdî: Xanî (hoz)
4. Şêx Evdilqadirê Xanî: Evdilqadirê **Xanî**
5. Mela Huseynê Bateyî: Bateyî (gund)
6. Şêx Muşerrefê Xunûkî: Xunûkî (gund)
7. Mistefa Ehmed Bêsarânî: Bêsarânî
8. Mela Ebdullahê Bazılî: Bazılî
9. Şêx Memdûhê Birîfkanî: Exlatî
10. Remezanê Cizîrî: Remezanê Cizîrî
11. Şêx Xalidê Zêbarîye Yekem: Xalidê Zêbarî
12. Mela Umerê 'Aşiq: Miksî
13. Şêx 'Ebdurehmanê Şawirî: Mêrgî (gund)
14. Şaweysê Koşkî: Koşk (gund)
15. Mihemed Emînê Şinoyî: Emînê **Şinoyî**
16. Xidrê Ehmedê Nanekelî: Deştî (deşta Hewlîr)
17. Mele Se'îd (Seydayê Xelatî): Xelatî
18. Mihemedê Kavarî: Kavarî (dever)
19. Mela Îmadeddînê Gurdilî: Gurdilî (gund)
20. Şêx Mihemed Emînê Heyderî: Heyderî, Emînê Heyderî, Heyderî Ehmed
21. Mela Mihemedê Hezanî: Mihemedê **Hezanî**

1.4. Netewî-Hemaseyî

1. Mela Remazanê Ebbasî: Remezanê **Kurdikî**
2. Mistefa Begê Sahibqiran: Kurdî
3. Resîdê Mehmed Axay Ferxe: Feramerz
4. Necmedînê Mela Resûlê Dêlêje: Arî
5. Mihemed Emînê Kake Şêxê Tewileyî: Kardoxî
6. Selaheddînê Gimgimî: Serda

1.5. Pîşeyên Perwerdeyê:

1. Mela Perîşanê Dînewerî: Mela
2. Melayê Cizîrî: Mela
3. Melay Cebarî: Mela
4. Feqiyê Teyran: Feqî
5. Mela Huseynê Bateyî: **Melayê Bateyî**
6. Feqe Reşîd: Feqî
7. 'Ebdulqadirê Resûlê Begzade: Feqê

1.6. Pîşeyên Dînî-Tesewifî

1. Eliyê Herîrî: Şêx Elî
2. Şêx Şemsedînê Exlatî: Xelwetî
3. Eliyê Herîrî: Huseynî
4. Seyîd Ye'qûbê Mahîdeşti: Seyyid, **Sey** Yaço
5. Mir Miheme Salihê Ni'metullahî: **Seyîd** Salih
6. 'Ebdulqadirê Resûlê Begzade: Derwêş
7. 'Ebdullah Muftî Pênciwêni: Muftî
8. Şêx Nûrî Şêx Salih: Şêx Nûrî
9. Kamilê 'Ebdulhekîmê Zenbilî: Îmamî
10. Mela Mihemed Nûrî: Neclu'l-ewhedî

1.7. Unwan:

1. Xelîlê Xidrê Kakeyî: Mîrza
2. Hesenê 'Ebdulqadirê Biyare: Şaho
3. Xefûrê Hacî 'Umer: Mîrza, Xale Mîrza, Mîrza Xefûr

2. Taybetiyên Derûnî

2.1. Xemgînî, Bedbînî

1. Harisê Bedlîsî: Sewadî
2. Mihemed Cewad: Siyahpoş
3. Mela İmadeddin: Reşpojan
4. Mihemed Teyar Paşa: Xerîbî
5. Weda'î: Weda'î

6. Mela Mehmûdê Meznawî: Hicrî
 7. Mistefa Begê Sahibqiran: Hicrî
 8. Mela Xidir: Naflî
 9. Husêné Ebdulletifê Mukriyanî: Huznî
 10. Husêné Ebdulletifê Mukriyanî: Damaw
 11. Mela Salihê Nesrullah: Herîq
 12. Mela Şêxmûsê Hesarî: Cegerxwîn
 13. Ehmedê Ebdullahê Goyanî: Cegerpel
 14. Seydayê Mela Husnî: Hezîn
 15. Seyîd Qedrî Haşimî: Hezîn
 16. Şêx Mihemedê Firsaffî: Hezîn
 17. Hacî Tewfîqê Mehmedî Axa: Pîremêrd
 18. Faiq 'Ebdullah: Bêkes
 19. Mihemed Helîmê Xursa Heftêxuhan: Xemkûr
 20. Kerîm Mehmûdê Kûhsarî: Xemgîn
 21. Mela Me'sûmê Gundşêxî: Dilbirîn
 22. Şêx 'Ebdullahê Daxî: Daxî
 23. Mela Xelîlê Mişextî: Mişextî
 24. Ebdurehman Begê Sahibqiran: Bîmar
 25. Ebdurehman Begê Sahibqiran: Rencûr
 26. Omerê Xalid Begê Şalebekî: Rencûr
 27. Mihemedê Yûsif: Rencûr
 28. Şukrî Fezlî: Hemmî
 29. Salihê Ehmed: Ahî
 30. Silêman Begê Zengene: Zebûnî
 31. Ebdurehman Şerefkendî: Hejar
 32. Mela Beşîrê Bedewî: Bêxew
 33. Xalid Axayê Zêbarî: Lixer
 34. Mela Mistefa Ehmed Bêsarani: Mehzûnî
 35. Mela Umerê 'Aşiq: Lixer
 36. Dilbikulê Cizîrî (Abdulkadir Bingöl): Dilkul
 37. Ehmedê Mistefayê Koyî: Dilzar
 38. 'Ebdullay Mela Mihemedê Berzencî: 'Aciz
 39. Mes'ûdê Mela 'Ebdullay Şenexeyî: Bêbes
5. Şêx Ubeydullah: Şewqî
 6. Şêx Mihemed Kerbelayî: Bedrî
 7. Şêx Riza Talebanî: Lami'
 8. Seyîd Qedrî Haşimî: Bedrî, Zeynî
 9. Naîfê Hesen: Tîrêj
 10. Mihemed Se'îdê Mizûrî: Mîhrî
 11. Mihemed Şerîfê Muezzin: Mîhrî
 12. Mihemed 'Ebdulla Dişeyî Sineyî: Mîhrî
 13. Hesenê 'Ebdulqadir Biyare: Şayıq
 14. Şêx Mehmûdê Berzencî Hefid: Nûrbexşî
 15. Es'edê Mela Xalidê Mehwî: Es'ed
 16. Fayiqê Mela 'Ebdullahê Zêwer: Bextiyar
 17. Mihemedê Çirustanî: Çirustanî
 18. Mihemed Salihê Mela Ehmed: Dîlan
 19. Mela 'Elî 'Ilmi: Cigernûr

3. Mîzac, Exlaq, Rewş

1. Şêx Muhyedînê Hêni: Sa'î
2. Fehmî Begê Peçarî: Namî
3. Ehmed Namî: Namî
4. Mela 'Ebdulerîmî Muderrîs: Namî
5. Mîrza Ebdurehîmê Sablaxî: Wefayî
6. Mela Yasînê Şemî: Yusrî
7. Mihemedê Mihemed Emînê Qadir: Kakey Fellah
8. Mela Nezîrê Bedewî: Dahî
9. Mehmûdê Mela Emînê Muftî: Bêxud
10. Mihemed Emînê Seyîd Hesenê Mukrî: Hêmin
11. Xalidê Hemed Axay Mukrî: Hêdî
12. Tahayê Maî: Behâî
13. Şêx Necmedînê Ebdurehmanê Berzencî: Sebrî
14. Mihemed 'Eliyê Mihemed Salih: Medhos
15. Xalid Beg: Halet
16. Mihemed Îmameddîn Senendedî: Heyran
17. Ebdurehman Begê Sahibqiran: Salim
18. Şêx Selîmê Texteyî: Salim
19. Mela Ehmedê Dêlêje: Fayîz
20. Ehmedê Hacî Şêx Xenî: Fewzî
21. Seyîd Ebdullah Mealî: Mealî
22. 'Ebdulmecîd Meliku'l-Kelam: Mecdî
23. Mah Şeref Xanima Kurdistanî: Mestûre

24. Burhanê Mihemedê Doxremeqî: Cahid
25. Mela 'Ebdusselamê Cizîrî: Nacî
26. Kamilê 'Ebdulhekîmê Zenbîlî: Awat
27. Mela Mihemedê Merîwanî: Narî
28. -: Mun'imî
29. Mela Mistefa Hilîliyê: Hişyar
30. Osman Es'ed Efendi Babij: Es'ed
31. Xulam Riza Erkewazî: Xulam
32. Şêx Muhyedînê Hêni: Heqî
33. Şêx Miheydînê Koyî: Nîhanî
34. Mela Resûlê Bêtûşî: Menfî
35. Necmedînê Şêx Ebdurehmanê Şorîce: Sabirî
36. Hesenê Mela Ebdullahê Zerderû: Cewherî
37. Cebar Axay Kanî: Kanî
38. Mihemed Marifê Mela Resûl: Remzî
39. 'Ebasê 'Eliyê Tala Bokan: Heqîqî
40. 'Ebdullahê Silêman Beg: Goran
41. WK Merdimîn: Merdimîn
42. Mihemedê Şêx Ehmedê Merdûxî: Wîsalî
43. Xelîlê Resûlê Sincawî: Waffî
44. Osmanê Hebîbê Koyî: 'Ewnî
45. Ehmedê Hesen Beg: Herdî
46. Mela Mihemedê Pîzanî: Madîh

4. Bedewî, Dildarî, Evîn

1. Melayê Cizîrî: Nîşanî
2. Şêx Ebdulezîzê Bedlîsî: Seyda
3. -: Macin
4. Mela Hesenê Bizgûrî: Keleş
5. Mihemed Silêmanê Hewramanî: Seydî
6. Mela 'Ebdullahê Mihemed: Zîwer
7. Tahirê Bêderî Berzencî: Fuad

5. Dîn

5.1. Pêwendiya Xweda û Insan

1. Seyîd Ebdullah Mealî: 'Ebdî
2. Mela Ebdurrehmanê Melekendî: 'Abidê Rehman
3. Ehmedê Sahibqiran: Hemdî
4. Mihemedê Tahayê Balîsanî: Da'î

1.2. Têgehêne Tesewuflî

2. -: Welî Dîwane
3. Şêx Ehmedê Feqîr: Feqîrê Ehmed

4. Şêx Ebdurehmanê Aqtepî: Rûhî
5. Şêx Mihemed Can: Xakî
6. Mihemedê Şêx Osmanê Belxî: Mehwî
7. Mihemedê Şêx Osmanê Belxî: Meşwî
8. Şêx Qutbedînê Korikî: Xakî
9. Mihemedê Helebcayî: Xakî
10. Mihemedê Şêx Rizayê Talebanî: Xalisî
11. Mela Ebdurehimê Tawegozî: Me'dûmî
12. 'Ebdulhemîdê Kanîmisîkanî: 'Irfan
13. Mihemed Lûte Cebarî: Feqîr
14. 'Ebdullahê M. Mewlûd Koyî: Xadim
15. -: Xewşî
16. -: Sadiq
17. -: Ze'îfî
18. Mîr Îmadedînê Hekkarî: Sebûrî
19. Ebdullah Begê Mîsbahuddîwan: Edeb
20. Mela 'Ebdulfetah Katibzade: Wehbî
21. Kerîm Mehîmûdê Kûhsarî: Temkîn
22. Seydayê Licî: Hadî
23. Mela Ehmedê Nalbend: Muxlis
24. Mela Mistefayê Dêlêjeyî: Sefwet
25. Kak Mistefayê Hîranî Sanî: Safî
26. 'Eliyê Babîr Axa: Kemalî
27. Mihemedê Şêx Husînê Helebce: Hilmî
28. Şêx Ehmed Hilmî: Hilmî
29. Memendê Resûl Axay Mîrawdelfî: Fanî
30. Xelîlê Resûlê Sincawî: Muxlis
31. Mela Îbrahîmê Katûnî: Racî

6. Siruşt

1. Yûsifê Karîzî: Karîzî
2. -: Mîna
3. Emîn Axayê Bekir Axayê Koyî: Exter

7. Huner

1. Mehîmûdê Ehmedê Zengene: Funûnî
2. Resûlê Mela Sadiq Mukriyanî: Edîb
3. Mela Meqsûdê Durefşanî: Durefşanî

8. Alav

1. Ebdullefîfê Şoşî: Seyfî
2. Ebûbekê Şêx Celalê Derbendîxan: Hewrî

9. Jimar

1. Kak 'Ebdullah Kak 'Elî: Sanî

Eger em di çarçoveya lîsteya jorîn de, mexlesên ku di edebiyata Kurdî de hatine bikaranîn ji aliyê wate û mesajê ve kategorîze bikin encameke weha derdikeve pêşıya me:

1. Zanyariyê Nasnameyê

1.1. Nav	
1.1.1. Navê xwerû	: 55
1.1.2. Nav bi teşeya nisbetê	: 8
1.1.3. Nav bi teşeya tesxîrê	: 3
1.1.4. Nav bi formeke cuda	: 4
1.1.5. Nav bi herfan	: 7
1.2. Bav	: 2
1.3. Dever	: 20
1.4. Netewî/Hemasî	: 6
1.5. Pîşeyê Perwerdeyê	: 7
1.6. Pîşeyê Dînî-Tesewifî	: 10
1.7. Unwan	: 3

2. Taybetiyê Derûnî

2.1. Xemgînî, Bedbînî	: 39
2.2. Ronahî, Geşbînî	: 19
3. Mîzac û Rewş	: 46
4. Bedewî, Dildarî, Evîn	: 7
5. Dîn	
5.1. Ebdîtiya Xweda	: 4
5.2. Têgehêن Tesewuñî	: 30
6. Siruşt	: 3
7. Huner	: 3
8. Alav	: 2
9. Jimar	: 1

Di çarçoveya van daneyan de derdikeve holê ku di nav 305 mexlesan de kategoriya zanyariyê nasnameyê bi 123 mexlesan di asta herî bilind de ye. Di nav wê de jî jîrkategoriya navan bi 79 mexlesan derdikeve pêş. Di nav kategoriyê dî de taybetiyê derûnî bi 58, mîzac û rewş bi 46, dîn/tesewif bi 33 mexlesan di astêن jorîn de ne. Ji vê tabloyê hin daneyêن ku çand û rewşa civakî ron dikin jî dikarin bêñ derxistin. Deverêñ ku helbestvan jê derketine, pîşeyê civakî, unwanêñ ku têñ bikaranîn û hwd. ji bo vê diyardeyê wek nimûne dikarin bêñ dayîn. Bikaranîna gelek mexlesêñ ku wateyêñ xemgînî û bedbîniyê didin jî, ji bo rewşêñ civakî û siyasî yên dijwar ku helbestvanêñ Kurd tê de jiyana xwe bûrandine wek nîşane dikarin bêñ dîtin.

4.5. Mexles ji Aliyê Orjîna Peyvan ve

Çawa li cem helbestvanêñ edebiyata Tirkî ya klasik jî tê çavdêrikirin (Akün, b. 9, r. 395), piraniya helbestvanêñ Kurdan jî mexlesêñ xwe ji peyvîn ‘Erebî û Farisî wergirtine ku ev yek eger bi bandora zimanêñ ‘Erebî û Farisî li ser edebiyata Kurdî ya klasik bê şîrovekirin dê ne şaş be. Bo nimûne mexlesêñ Sa’î (xebatkar), Lami’ (yê ku dibiriqe) û Herîq (yê şewifî) xwerû bi ‘Erebî û mexlesêñ Xakî (axî), Bîmar (nexweş) û Pertew (ronî) jî xwerû bi Farisî ne. Di sedsala XXem de bi tesîra hizrêñ nû ên siyasî û pêşketina edebiyata modern, ji aliyê hin helbestvanan ve mexlesêñ bi Kurdî jî hatine bikaranîn ku hin ji wan ev in:

- | | |
|-----------------------------|-------------|
| 1. Mela Şêxmûsê Hesarî | : Cegerxwîn |
| 2. Mela Hesenê Bizgûrî | : Keleş |
| 3. Naîfê Hesen | : Tîrêj |
| 4. Ehmedê Ebdullahê Goyanî | : Cegerpel |
| 5. Mela Mistefa Hilîliyâ | : Hişyar |
| 6. Mela Beşîrê Bedewî | : Bêxew |
| 7. Mela Imadeddîn | : Reşpojan |
| 8. Hacî Tewfiqê Mehmûd Axa | : Pîremêrd |
| 9. Faiq 'Ebdullah | : Bêkes |
| 10. Mela 'Ebdullahê Mihemed | : Zîwer |
| 11. Ebdurehman Şerefkendî | : Hejar |
| 12. Selaheddînê Gimgimî | : Serda |

4.6. Pirmexlesi

Xaleke dî ya bi mexlesan ve girêdayî diyardeya pirmexlesiyê ye. Pirmexlesî, ji aliyê helbestvanekî ve herî kêm bikaranîna du mexlesan e. Herçiqas piraniya helbestvanan di helbestên xwe de tenê mexlesek bi kar anîne jî, ev jimar li cem hin helbestvanan dibe didu, li cem hinan dibe sisê û li cem hinan ji sisêyan jî derbas dibe. Di çarçoveya vê xebatê de di edebiyata Kurdî ya klasîk de helbestvanan ku ji yekê zêdetir mexles bi kar anîne di tabloya jêrîn de bi awayekî kategorîk hatine nîşandan:

HELBESTVANÊN PIRMEXLES			
Dîyalekt		Helbestvan	Du Mexles
Edebiyata Goranî	1	Hesenê 'Ebdulqadirê Biyare	Şayiq, Şaho
	2	Kerîm Mehmûdê Kûhsarî	Xemgîn, Temkîn
	3	Mela Mistefa Ehmed Bêsaranî	Bêsaranî, Mehzûnî
	4	Seyîd Ebdullah Mealî	Mealî, 'Ebdî
Edebiyata Kurmancî	1	Mela Huseynê Bateyî	Bateyî, Melayê Bateyî
	2	Şêx Ehmedê Feqîr	Ehmed, Feqîrê Ehmed
	3	Şêx 'Ebdurehmanê Şawirî	Mêrgî, 'Ebdurehman
	4	Şêx Ebdulezîzê Bedlîsî	Şeyda, 'Ebdul'ezîz
	5	Şêx Ebdulqadirê Hezanî	Ebdulqadir, Ebdulqedîr
	6	Şêx Ehmed Hilmî	Hilmî, Ehmed
	7	Şêx Mihemed Kerbelayî	Bedrî, Kerbelayî
	8	Şêx Muhyedînê Hênî	Sa'î, Heqî
	9	Mela Umerê 'Aşiq	Lixer, Miksî
	10	Mela Zahirê Tendûrekî	Zahir, Zuweyhir

Edebiyata Soranî	1	Mihemedê Şêx Osmanê Belxî	Mehwî, Meşwî
	2	Şêx Nûrî Şêx Salih	Nûrî, Şêx Nûrî
	3	Şêx Riza Talebanî	Riza, Lami'
	4	Mistefa Begê Sahibqiran	Hicrî, Kurdî
	5	Husênê Ebdulletifê Mukriyanî	Huznî, Damaw
	6	Mela Wesmanê Silêmanî	Fayeq, Hezîn
	7	'Ebdulqadirê Resûlê Begzade	Feqê, Derwêş
	8	Emîn Axayê Bekir Axayê Koyî	Exter, Emîn
	9	Mihemed Emînê Şinoyî	Emîn, Emînê Şinoyî
	10	Xelilê Resûlê Sincawî	Wafî, Muxlis
Edebiyata Zazakî	1	Seydayê Mela Husnî	Hezîn, Husnî
		Helbestvan	Sê Mexles
Edebiyata Kurmancî	1	Mela Perîşanê Dînewerî	Mela, Perîşan, Perîş
	2	Eliyê Herîrî	Elî, Şêx Elî, Huseynî
	3	Melayê Cizîrî	Mela, Nîşanî, Ehmed
	4	Feqiyê Teyran	Miksî, Mîm û Hê, Feqî
	5	Remezanê Cizîrî	Remezan, Remezanê Cizîrî, Îbn Dewdan
	6	Fehmî Begê Peçarî	Namî, Fehmî, Fehîm
Edebiyata Soranî	1	Xefûrê Hacî 'Umer	Mîrza, Xale Mîrza, Mîrza Xefûr
	2	Kamilê 'Ebdulhekîmê Zenbîlî	Awat, Kamil, Îmamî
	3	Ebdurehman Begê Sahibqiran	Bîmar, Rencûr, Salim
Edb.Zazakî	1	Mela Mihemedê Hezanî	Mem, Mîm, Mihemedê Hezanî
		Helbestvan	Çar Mexles
Edebiyata Kurmancî	1	Seyîd Qedrî Haşimî	Qedrî, Hezîn, Zeynî, Bedrî
		Helbestvan	Şes Mexles
Edebiyata Goranî	1	Xelîlê Xidrê Kakeyî	Xelîl, Xelîl Munewwer, Mihemed Xelîl, Mela Xelîl, Mîrza Xelîl, Mîrza
Edebiyata Kurmancî	1	Şêx Mihemed Emînê Heyderî	Heyderî, Heyderizade, Emîn, Emînê Heyderî, Heyderizade Emîn, Heyderî Ehmed
		Helbestvan	Heş Mexles
Edebiyata Kurmancî	1	Mela Sîraceddinê Xelîlî	Sîraceddin, Mihemed Sîraceddin, Mihemed Sîrac, Sîrac, Sîracê Xelîlî, Sîn, Sîrac Ataç, Sîn û Cîm

Bikaranîna çend mexlesan, herî zêde di çarçoveya guherandina mexlesê de dikare bê şirovekirin. Yanî van helbestvanan di destpêkê de mexlesek bi kar anîne, lêbelê piştre ev mexlesên xwe guherandine û dest bi bikaranîna mexlesekî nû kirine. Bi piranî mexlesên ku pêşî bi kar anîne demkî ne û mexlesên ku piştre hilbijartine wek mexlesên wan ên eslî ketine şûna yên berê. Bi awayekî siruştî mexlesên ku helbestvanan her dawî biryar li ser dane û herî zêde bi kar anîne, ji wan re bûne wek nasnameya edebî û helbestvan bi wê mexlesê navdar bûne. Ev yek di bikaranîna du, yan sê mexlesan de şiroveya giştî ye. Dibe ku terkkirina mexlesekê û neqandina mexleseke nû her dem ne şert be û hin helbestvanan du, yan sê mexles bi hev re jî bi kar anîbin. Di vê rewşê de helbestvan li gor pêdiviya kêşê û li gor naveroka helbestê mexlesekî ji wan hildibijêre ku nimûneyên van her du rewşan jî di helbesta Farisî ya klasik de hatine tesbîtkirin (Fesâî, 1373, r. 567).

Bêguman di pirmexlesiyê de tesbîtkirina sedemê bikaranîna çend mexlesan pir zehmet e. Gelo kîjan helbestvanî mexlesên xwe bi hev re bi kar anîne û kîjanî piştî ku yek terikandiye dest bi bikaranîna yê dî kiriye? Bêguman ji bo bersiva vê yekê divê hin nîşane hebin. Bo nimûne ji ber ku di dest me de nîşane nînin, ji bo mexlesên Melayê Cizîrî (Mela, Nîşanî û Ehmed) em bi hêsanî nikarin şiroveyekê bikin. Dibe ku Melayê Cizîrî ev mexles bi rêzê bi kar anîbin û dibe ku her sê bi hev re bi kar anîbin û di her helbestekê de li gor pêdiviya kêş û naveroka helbestê yek ji wan hilbijartibe. Lêbelê em vê dizanin ku di nav her sê mexlesên wî de ya herî zêde berbelav "Mela" ye.

Di edebiyata Soranî de di vê biwarê de hin dane hatine tesbîtkirin. Bo nimûne di jiyana helbestvanê Kurdiya Soranî Salim de guherandina mexlesê dikare bê şopandin. Salim, ji ber ku kesekî nexweş û lawaz bûye di destpêkê de bi wateya kesê nexweş mexlesên "Bîmar" û "Rencûr" bi kar anîne, lêbelê piştî ku baş bûye bi wateya kesê saxlem mexlesa xwe kiriye "Salim" (Xeznedar, 2002, r. 155-157). Bi heman rengî Kerîm Mehmûdê Kûhsarî ku ji devera Hewremanê ye, di destpêkê de mexlesa "Xemgîn" bi kar anîye, lêbelê piştre ev mexles terk kiriye û li şûna wê mexlesa "Temkîn" bi kar anîye (Doskî, r. 298). Ji vê jî tê fêmkirin ku di jiyana helbestvan de qonaxa xemgîniyê xilas bûye û êdî qonaxa temkîn û huzûrê dest pê kiriye. Mistefa Begê Sahibqiran ku mexlesên Hicrî û Kurdî bi kar anîne, muhemelen li Îranê di qonaxa müşextîbûnê de mexlesa "Hicrî" bi kar niye. Piştre ji ber karesatên mîrnîsiya Baban navekî neteweyî li xwe kiriye û mexlesa xwe kiriye "Kurdî" (Xeznedar, III, r. 168). Dîsa Xelîlê Resûlê Sincawî pêşî mexlesa "Waffî" bi kar anîye. Lêbelê piştî kû li ser destê Şêx Mistefayê Herşemî bûye sûfiyê Neqşebendîtiyê mexlesa xwe ya berê terk kiriye û mexlesa "Muxlis" bi kar anîye (Xeznedar, VII, r. 169).

4.7. Hevpariya Mexlesan

Xaleke girîng a ku bi mexlesê re peywendîdar jî hevpariya mexlesan e. Mebest ji mexlesên hevpar ew mexles in ku di zeman û mekanên cuda de ji aliyê du, yan zêdetir helbestvanan ve bi hevparî hatine bikaranîn. Di dirêjahiya tarîxa edebiyata Kurdî ya klasîk de mexlesên ku ji ber sedemên curbicur ji aliyê çendîn helbestvanan ve bi hevparî hatine bikaranîn ne hindik in. Di tabloya jérîn de emê di çarçoveya mexlesên ku di vê xebatê de hatine tesbîtkirin de, cih bidin mexlesên hevpar ên ku di edebiyata Kurdî ya klasîk de hatine bikaranîn:

MEXLESÊN HEVPAR			
	Mexles	Du Helbestvan	Dîyalekt
1	Miksî	Feqiyê Teyran Mela Umerê ‘Aşiq	Edb. Kurmancî Edb. Kurmancî
2	Remezan	Remezanê Cizîrî Mela Remazanê Ebbasî	Edb. Kurmancî Edb. Kurmancî
3	Laxer	Xalid Axayê Zêbarî Mela Umerê ‘Aşiq	Edb. Kurmancî Edb. Kurmancî
4	Xerîbî	Mihemed Teyar Paşa Mihemed Xerîbê Şoşî	Edb. Kurmancî Edb. Kurmancî
5	Nûrî	Şêx Nûredînê Birîfkanî Mela Nûrullahê Godîskî	Edb. Kurmancî Edb. Kurmancî
6	Hadî	Seydayê Licî Şêx Muhemed Hadiyê Qewmanî	Edb. Kurmancî Edb. Kurmancî
7	Salim	Ebdurehman Begê Sahibqiran Şêx Selîmê Texteyi	Edb. Soranî Edb. Soranî
8	Es’ed	Es’edê Mela Xalidê Mehwî Osman Es’ed Efendi Babij	Edb. Soranî Edb. Zazakî
9	Hicrî	Mela Mehmûdê Meznawî Mistefa Begê Sahibqiran	Edb. Soranî Edb. Soranî
10	Hilmî	Mihemedê Şêx Husênê Helebce Şêx Ehmed Hilmî	Edb. Soranî Edb. Kurmancî
11	Mem	Mihemed Mewlûdê Sabraxî Mela Mihemedê Hezanî	Edb. Soranî Edb. Zazakî
12	Muxlis	Xelilê Resûlê Sincawî Mela Ehmedê Nalbend	Edb. Soranî Edb. Kurmancî
13	Xelatî/ Exlatî	Şêx Memdûhê Birîfkanî Mele Se’id (Seydayê Xelatî)	Edb. Kurmancî Edb. Kurmancî
Sê Helbestvan			
1	Tahir	Baba Tahirê Hemedanî Tahir Begê Caf Şêx Tahirê Şoşî	Edb. Lorî Edb. Soranî Edb. Kurmancî
2	Mela	Mela Perîşanê Dînewerî Melayê Cizîrî Melay Cebarî	Edb. Goranî Edb. Kurmancî Edb. Goranî
3	Feqî	Feqiyê Teyran Feqe Reşîd ‘Ebdulqadirê Resûlê Begzade	Edb. Kurmancî Edb. Kurmancî Edb. Soranî

4	Xanî	Ehmedê Xanî Mihemedê Qasimê Bayezidî Şêx Evdilqadirê Xanî	Edb. Kurmancî Edb. Kurmancî Edb. Kurmancî
5	Rencûr/ Rencûrî	Ebdurehman Begê Sahibqiran Omerê Xalid Begê Şalebekî Mihemedê Yûsif	Edb. Soranî Edb. Soranî Edb. Goranî
6	Mîhrî	Mihemed Şerîfî Muezzin Mihemed ‘Ebdulla Dişeyî Sineyî Mihemed Se’îdê Mizûrî	Edb. Soranî Edb. Soranî Edb. Kurmancî
7	Hezîn	Şêx Mihemedî Fîrsatî Seyîd Qedîrî Haşimî Seydayê Mela Husnî	Edb. Kurmancî Edb. Kurmancî Edb. Kurmancî
8	Xakî	Şêx Mihemed Can Şêx Qutbedînê Korikî Mihemedê Helebcayî	Edb. Kurmancî Edb. Kurmancî Edb. Soranî
9	Namî	Fehmî Begê Peçarî Ehmed Namî Mela ‘Ebdulkerîmî Muderrîs	Edb. Kurmancî Edb. Kurmancî Edb. Soranî
Mexles		Çar Helbestvan	
1	Şewqî	Mela Xelîlê Sêrtî Mela Mihemedê Colemêrgîyê Xanî Şêx Ubeydullah Şewqî Salih Zekî Sahibqiran	Edb. Kurmancî Edb. Kurmancî Edb. Kurmancî Edb. Soranî
Mexles		Pênc Helbestvan	
1	‘Elî	Eliyê Herîrî Seyîd ‘Eliyê Findikî Mela ‘Eliyê Botî Mela ‘Eliyê Baqustanî ‘Elî Beg Salar Se’îd Heyderî	Edb. Kurmancî Edb. Kurmancî Edb. Kurmancî Edb. Kurmancî Edb. Kurmancî
Mexles		Deh Helbestvan	
1	Ehmed	Melayê Cizîrî Şêx Ehmedê Feqîr Mela Ehmedê Heyderî Mela Ehmedê Nalbend Mela Ehmedê Xelatî Mela Ehmedê Zinarexî Şêx Ehmed Hilmî Ehmed Begê Koması Ehmed Muxtar Caf Ehmedê Derwêş/Exol	Edb. Kurmancî Edb. Kurmancî Edb. Kurmancî Edb. Kurmancî Edb. Kurmancî Edb. Kurmancî Edb. Kurmancî Edb. Soranî Edb. Soranî Edb. Soranî

Li gor vê tabloyê di edebiyata Kurdî ya klasîk de, li ser hev 25 mexles ji aliyê 72 helbestvanan ve bi hevparî hatine bikaranîn. Ji van mexlesan 13 heb ji aliyê 2, 9 heb ji aliyê 3, hebek ji aliyê 4, hebek ji aliyê 5 û hebek jî ji aliyê 10 helbestvanan ve hatine parvekirin. Di nav van mexlesan de mexlesa ku herî zêde hatiye parvekirin, bi 10 helbestvanan, “Ehmed” e. Piştî wê bi 5 helbestvanan “Elî” û bi 4 helbestvanan “Şewqî” tê.

Bi piranî helbestvanan, bê zanebûn û bêyî ku haya wan ji hev hebe di zeman û mekanên cuda de heman mexles bi kar anîne. Lewra eger helbestvan mexlesen berê bi zanebûn bi kar bînîn, talokeya tevliheviya helbesten wan dê rû bide ku ev yek li dijî armanca bikaranîna mexlesê ye. Wê demê pêwîst e hin sedemê hevpariyê hebin. Wisa xuya ye ku di hevpariya mexlesan de rola sereke ya tewarudê ye, yanî hevparî di encama rasthatinekê de ye. Aşkera ye ku helbestvanen ku ji mexlesen berê haydar in, ew mexles bi kar neanîne. Em vê yekê ji Melayê Cizîrî û peyrewen wî yên edebiyata Kurmancî baş fêm dikan. Lewra digel ku Melayê Cizîrî di asta herî bilind de hatiye naskirin û bandoreke zêde li pey xwe hiştiye jî, em piştî Melayê Cizîrî di edebiyata Kurmancî de rastî helbestvanekî ku mexlesa "Mela" bi kar anîye nayên. Ev jî nîşan dide ku helbestvan bi zanebûn mexlesen ku berê hatine bikaranîn hilnabijîerin. Digel vê yekê jî, eger heman mexles hatibin bikaranîn, ew bi tewarudê dikare bê ızahkirin. Bo nimûne, çawa di lîsteya jorîn de jî tê dîtin, ji edebiyata Kurmancî 7 û ji ya Soranî 3 helbestvanan (bi giştî 10) navên xwe "Ehmed" wek mexles bi kar anîne. Guman tuneye ku ji van helbestvanan şes hebênen edebiyata Kurmancî (Şêx Ehmedê Feqîr, Mela Ehmedê Heyderî, Mela Ehmedê Nalbend, Mela Ehmedê Xelaftî, Şêx Ehmed Hilmî û Mela Ehmedê Zinarexî) ku peyrewen Melayê Cizîrî ne, bi navê Melayê Cizîrî (Ehmed) serwext in. Lîbelê ji ber ku Mela herî zêde mexlesen Mela û Nîşanî bi kar anîne, di bikaranîna mexlesa Ehmed de hizra endîşeyê nekirine. Li aliye kî dî her sê helbestvanen edebiyata Soranî bi ihtîmaleke mezin, bêyî ku haya wan ji Melayê Cizîrî hebe mexlesa Ehmed bi kar anîne. Her şes helbestvanen edebiyata Kurmancî jî, bêyî ku haya wan ji hev hebe heman mexles bi kar anîne. Bi awayekî mentiqî eger haya wan ji hev hebûya dê heman mexles bi kar neanîban. Ji vê rewşê encameke weha jî dikare bê derxistin: Helbestvanen ku navên wan ên resen Ehmed e, di mexlesê de tercîha bikaranîna navên xwe yên resen kirine. Bi baweriya me ji ber du sedeman ev mexles ji aliye wan ve hatiye tercîhkirin. Sedemê yekem wateya wê ya dînî ye ku ji aliye kî ve pesnê Xudê îfade dike, ji aliye kî ve jî navekî Cenabê Pêxember e. Sedemê duyem jî her du hêceyên wê yên girtî ne ku bi hêceyên yekem û duyem ên girtî yên tef'ileya "mustef'ilun" (- - + -) re di nav hevsengiyê de ne ku ev tef'ile di helbesta Kurdî de di asteke bilind de hatiye bikaranîn

Bêguman hevpariya mexlesan yek ji diyardeyên mexlesê ye ku aliye kî xwe yê problematîk û xeternak jî heye. Lewra bikaranîna heman mexlesî ji aliye helbestvanen cuda ve, di aîdiyeta metnê edebî bo xwedîyê wê yê rasteqîn de dikare bibe sebebê tevlîheviyan û di encamê de metnek bo kesekî ku ne xwedîyê wê ye bi şaşî dikare bê nisbetkirin. Di edebiyata Tirkî ya klasik de jî, gelek şaşiyen ku ji hevpariya mexlesan neşet dikan, hatine kirin û ji ber vê yekê jî hevpariya mexlesan bûye qadeke girîng a lêkolînên edebî. (Bo nimûne bnr. İsen, 1997; Adak, 2012, r. 157-171).

Eger em nimûneyekê ji edebiyata Kurmancî bidin, em dikarin behsa mexlesa "Lixer" bikin ku ji aliyê Xalid Axayê Zêbarî û Mela Umerê 'Aşiq ve bi hevparî hatiye bikaranîn. Texmîsa ku bi mexlesa "Lixer" li ser xezeleke Melayê Cizîrî hatiye çêkirin û metnê wê di çapêñ dîwana Melayê Cizîrî de cih digire, heta niha bo Şêx Xalidê Zêbarî dihat nisbetkirin (Adak, 2015, r. 264). Lêbelê vê dawiyê heman texmîs ji aliyê malbata Mela Umerê 'Aşiq ve bo Mela Umerê 'Aşiq jî tê nisbetkirin (Yilmaz, 2019, r. 319). Ji ber ku van her du helbestvanan jî mexlesa "Lixer" bi kar anîne, xwediyê rasteqîn ê vê texmîsê dibe cihê pirsiyariyê û wek xaleke problematîk a edebiyata Kurdî ya klasîk ku ji hevpariya mexlesê neşet dike derdi keve pêş. Di edebiyata Soranî de jî Ebdurehman Begê Sahibqiran (k.d.1869) û Şêx Selîmê Texteyî (k.d. 1911) mexlesa "Salim" bi hevparî bi kar anîne. Lêbelê ji bo ku helbestên her duyan ji hev bêñ cudakirin, Texteyî di nav edebiyatvanan de wek "Salimê Sine" hatiye binavkirin (Xeznedar, IV, 605). Bi kurtî, di qada lêkolînêñ mexlesan de mijara hevpariya mexlesan wek xaleke gelekî girîng derdikeve pêş. Loma di rewşen bi vî rengî de ji bo ku biryareke durist bê dayîn divê lêkoler bi baldarî tevbigerin.

5. ENCAM

Çawa ku ev xebat jî nîşan dide, mexles bi taybetî ji sedsala XVem û vir ve bi qasî 600 salî ji aliyê helbestvanêñ Kurd ên klasîk ve wek taybetiyeke jêneger a helbestê hatiye dîtin. Bêguman di gotarekê bisînor de, tesbîtkirina hemû mexlesêñ edebiyata Kurdî ya klasîk ne pêkan e. Lêbelê digel vê jî 305 mexlesêñ ku ji aliyê 237 helbestvanêñ Kurd ve hatine bikaranîn, derheqê tradîsyona mexlesêñ Kurdî de hizrekê dide me. Em di wê baweriyê de ne ku di demêñ pêş de bi pêşvebirina lêkolînan ev jimar dê gelekî zêde bibe. Bêguman wê demê emê bikarin di mijarêñ wek şêweyêñ bikaranîna mexlesê, wateyêñ mexlesê, pirmexlesî û hevpariya mexlesan de encamêñ nû bi dest bixin û analîzêñ rasteqîntir bikin. Em hêvî dikin ku encamêñ ku di vê gotarê de hatin bideshtistin rê li ber lêkolînêñ nû vekin û bibin sebebê pêşxistina vê qadê.

Herî dawî, wek çavdêriyekê em dixwazin bibêjin ku bi taybetî li Bakur, hin helbestvanêñ edebiyata Kurmancî ya klasîk, di derdorêñ edebî de ne bi mexlesêñ xwe, bi kunyeyêñ xwe yên dirêj têñ binavkirin û bi wî awayî têñ naskirin. Bo nimûne li şûna mexlesa "Xelwetî" "Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî" û li şûna mexlesa "Rûhî" kunyeya "Şêx Evdurehmanê Aqtepî" tê bikaranîn. Bêguman divê mirov kunyeyêñ tam ên Xelwetî û Rûhî bizane û wan li cihê pêwîst bi kar bîne, lêbelê ev kunyeyêñ wan herçiqas nasnameya wan a tam nîşan didin jî (statuya dînû, tesewufî, navêñ wan û devera wan) aliyê wan ên edebî qet refere nakin. Ji ber ku van helbestvanan di metnêñ edebî de li şûna navêñ xwe yên resen navêñ taybet ên edebî (mexles) bi kar anîne, divê ev tercîha wan jî aliyê me ve jî li ber çavan bê

girtin. Loma jî pêwist e di ders û lêkolînên edebiyatê de, di derdor û çalakiyên edebî de navêwan ên edebî bênen bikaranîn û mexlesên wan neyên jibirkirin. Ev yek bi taybetî di edebiyatê Farisî û Tirkî de û herweha di edebiyata Kurdiya Soranî de jî wek tradîsyonekê rûniştiye, lêbelê di Kurdiya Kurmançî de heta niha tam rûniştiye. Loma divê em di vê mijarê de bi baldarâ tevbigerin û pêdiviyêncanda edebiyatê bînin cih.

6. ÇAVKANÎ

Çavkanîyên Çapkiri:

- Adak, A.** (2012). *Liceli Şairlere Genel Bir Bakış*, "Dünden Bugüne Lice Sempozyumu", Mardin: Mardin Artuklu Ünv. Yay.
- (2012) "Li Cizîrê Muhîteke Edebî: Dergahê Şêx Seyda û Rola Wî di Edebîyata Kurdi de", *Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre Sempozyumu*, ed. M. Nesim Doru, İstanbul: Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları.
- (2015), *Destpêka Edebiyata Kurdi ya Klasik*, (çapa sêyem), İstanbul: Nûbihar.
- 'Ilmî, M. 'E.** (2012). *Mela 'Eliyê 'Ilmî Jiyan, Berhem û Helbestêñ Wî*, amd. Necatê Zivingî, Stenbol: Banga Heq.
- Acar, H.** (2016). *Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr-Metn û Lêkolîn*, çapa yekem, İstanbul: Nûbihar.
- Adak A.** (2016). "Şewqiyê Xanî li Pey Şopa Ehmedê Xanî Berawirdkirinek li Ser Mulemme'ên Wan ên Çarzimanî", *Nûbihar Akademî*, 3 (5), r. 36-65.
- Adak, A.** (2012). "Dîvân Edebiyâtında Mahlasların Karıştırılması - Za'îfî ve Za'fî Mahlaslı Şairler Örneği", *EKEV Akademi Dergisi*, XVI/50.
- Akün, Ö. F.** (1994). "Divan Edebiyatı", *DIA*, b. 9.
- Aqtepî, Ş. 'E.** (2011). *Rewdu'n Neîm*, amd. Tehsin İbrahîm Doskî, Dihok: Spîrêz.
- Arslan, S. M. E.** (2013). *Dîwana Seydayê Mele Elî Arslan*, İstanbul: Doz.
- Axtepî, Ş. H.** (2009), *Dîwana Hesbî*, amd. Zeynelabidîn Zinar, İstanbul: Doz
- Aykaç, Y.** (2015). Çewlîg: *Dîwana Hezîn (Metn, Lêkolîn û Ferheng)*, Zanîngeha Bingolê, Enstituya Zimanê Zindî.
- Badî, Î.** (2011). *Remezanê Cizirî - Di duyvûn û Tuyjandineka Dîtir da Qeftek ji Helbestêñ Wî*, Dihok: Zankoya Dihokê Fakeltiya Zanistêñ Mirovayetî Sikula Adabê Senterê Vekolînên Kurdi û Parastina Belgenaman.
- Bedewî, M. N.** (2004). *Dîwana Dahî*, Dihok: Spîrêz.
- Beki, M. A.** (2015). *Diwon Cebexçuri*, Bingöl: Bingöl Üniversitesi Yay.
- Birîfkanî, Ş. M. E. B.** (2001). *Dîwana Şêx Memdûhê Exlatiyê Birîfkanî*, Hewlêr: Aras
- Birîfkanî, Ş.N.** (2002). *Dîwan Zibanê Kurdi*, amd. Zahid Birîfkanî, Erbil: Aras
- Can, Ş. M.** (1992). *Leyl û Mecnûn*, wergêr ji tîpêñ Erebî: Zeynelabidîn Zinar, Stockholm: Pencînar.
- Cegerxwîn,** (2003). *Sewra Azadî*, İstanbul: Avesta.
- Cizirî, D.** (2015). *Siyabend û Xecê*, İstanbul: Nûbihar.

- Cizîrî**, M. (2010). *Dîwan*, amd. Selman Dilovan, İstanbul: Nûbihar.
- Cum'e**, 'E. M. (2003). *el-Mu'elleqat es-Seb' bi Riwayet Ebî Bekr Muhammed b. el-Qasim el-Enbarî*, Kuveyt: Muesseset Caîzet el-Babîfîn.
- Çelebî**, E. (2010). *Günümüz Türkçesiyle Evliya Çelebi Seyahetnamesi* (b. II), İstanbul: YKY.
- Dêrsilavî**, M. A. (2004), *Menzûmetu Gulzarê Can*, bê cih: bê weşanxane.
- Doru**, M. N. (2016). "Berawerdkirina Dîwana Melayê Cizîrî û Dîwana Seyîd Qedrî Haşimî ji Aliyê Hizra Tesewûfî ve", *Nûbihar Akademî*, s. 3, j. 5.
- Doskî**, T. Î. (2011), *Mela Ebdullahê Hîzanî û Şa'irên Malbata Wî*, Dihok: Spîrêz.
-, (2016), "Sebûrî: Mîr Îmededdînê Hekarî", *Nûpelda*, j. 22, r. 65-69.
-, (2016). "Mela Mihemedê Xanî (Şewqî) û Dîwana Wî", *Kovara Waar Dîrok*, j. 11., r. 24-51.
-, (b.d.). *Baxê Îrem*, Duhok: Spîrêz.
- Ekmekçi**, G. (2012). *Seyda Molla Halil ve M. Halid Korkusuz'un İlmî ve Edebî Kişilikleri*, "Dünden Bugüne Lice Sempozyumu", Mardin: Mardin Artuklu Ünv. Yay.
- Ertekin**, E. (2018). *Tesewif di Dîwana Şeyda de*, Çewlîg: Zanîngeha Bingolê, Enstîtuya Zimanê Zindî.
- Ertekin**, M. Z. (2016). *Dîwançeya Baqustanî*, çapa yekem, Wan: Lorya.
- Erzen**, S. S. (1430). *Dîwana Şemsî*, amd. M. Aydîn ed-Dirîskî el-Erûhî, Sêrt: bê weşanxane.
- Fesaî**, M. R. (1373). *Enwa'ê Şî'rê Farisî*, Şîraz.
- Findikî**, S. E. (2010), *Dîwan*, çapa çarem, İstanbul: Nûbihar.
- Gerdî**, E. (1999), *Kêşî Şî'rî Klasîkî Kurdî û Berawirkirdinî legel 'Erûzî 'Erebî û Kêşî Şî'rî Farisî da*, Hewlêr: Hikûmetî Herêmî Kurdistan-Iraq Wezareti Rewşenbîri.
- Gezer**, S. (2015), *Dîwana Mela Yasînê Şemî Yusîrî* (Metin û Lêkolîn), Çewlîg: Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Bîngolê Enstîtuya Zimanê Jîndar Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî.
- Gümüş**, N. (2019). Dîwana Mela Sîraceddinê Xelîlî (Gulcivîn), Mêrdîn: Teza Lîsansa Bilind ya Neçapbûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanê Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.
- Haşimî**, S. Q. (2016). *Dîwana 'Irfân*, amd. M. Nesim Doru, çapa yekem, İstanbul: Nûbihar.
- Heftêxuhan**, M. H. (2003), Pêdiviyê Ol û Dînê İslâmê, nusxeya fotokopî ya destnivîsê, pirtûkxaneya taybet a A. Adak
- Heyderî**, S. M. E. (2012), "Dîwan û Munacat", *Dîwana Heyderî*, ber. M. Diyaeddîn Heyderî, İstanbul: Nûbihar.
- Heyderî**, Ş. M. E. (2012), "Dîwan", *Dîwana Heyderî*, ber. M. Diyaeddîn Heyderî, İstanbul: Nûbihar.
- Hezanî**, M. M. (b.t.). *Mecmû'ya Menzûmetan*, ber. Zeynelabidîn Amidî, Diyarbekir: Diyarbekir Söz Mat.
-, (2011). "Eqîdetu'l-Îman" 'Eqîdenameyêñ Kurdî, ber. Tehsîn Î. Doskî, Hewlêr: Ekadîmîyayî Kurdî.
- Hezanî**, Ş. E. (2016), *Dîwan*, amd. Mela Burhanê Tarînî, Lîs: Diyarbekir.
- Hezroyî**, S. H. F. (2012), *Dîwana Fethî*, ber. Tehsîn Î. Doskî, Dihok: Spîrêz.

- Hilîliyê**, M. M. (b.t.), *Dîwan Gulzara Xemlandî*, amd. Mele Seîd (Seydayê Xelatî) İstanbul: Ektra Matbaacılık.
- Înan**, E. (2014). *Dîwan*, İstanbul: Nûbihar.
- İpekten**, H. (1996). "Gazel", *DIA*, b. 13. r. 440-442.
- Isen**, M. (1997). "Dîvân Edebiyâtında Mahlasdaş Şâirler", *Ötelerden Bir Ses- Dîvân Edebiyâti ve Balkanlarda Türk Edebiyâti Üzerine Makaleler*, Ankara: Akçağ.
- Kayaokay**, İ. (2017). *Gazellerde Mahlasın Konumu ve Mahlasın Redif Olarak Kullanılması*, International Journal of Language Academy, j. 5/4, r. 139/161.
- Kavarî**, M. (1391). *Dîwanê Mihemedê Kavarî*, Diyarbakır: bê weşanxane.
- Keleş**, S. (b.t.). *Helebçe Diwana Şesan*, Dihok: Weşanên Êkîtiya Nivîskarêñ Kurd.
- Kirkan**, A. (2018). *Bîyîşa Pêxemberî ya Osman Esad Efendî û Destpêkê Edebiyatê Klasîk yê Kîrmancî*, İstanbul: Vate.
- Korkusuz**, Ş. (2004). *Tezkire-i Meşayîh-i Amid*, İstanbul: Kent Yay.
- Kurdo**, Q (1992). *Tarîxa Edebyeta Kurdî*, Ankara: Öz-ge.
- Kurnaz**, C. & Çeltik (2013). H., *Divan Şiiri Şekil Bilgisi*, Ankara: Kurgan Edebiyat.
- Kurşun**, M. S. (2002). *Rêbaz Dîwana Yekem*, Stenbol: Mizgin Yay.
- Merdimîn**, WK. (2015). *Dîwan*, Stenbol: Peywend.
- el-Mêrgî**, Ş. 'E., (2013). *Dîwan*, amd. Mihemed Muxlis b. Şeyx 'Ebdurehman, İstanbul: Nûbihar.
- Mewlewî** (b.d.). *Dîwanî Mewlewî*, amd. Mela Ebdulkérîm Muderris, Bexda: Wezarefî Me'arif.
- Mişextî**, M. X. (2012). *Dîwana Mela Xelîlê Mişextî*, ber. Newzad Mela Xelîl Mişextî û Kameran İbrahîm Mişextî, Dihok: Spîrêz.
- Nalbend**, E. (1998). *Baxê Kurda Sercemê Dîwana Ehmedê Nalbend*, amd. T. Mayî, R. Findî, Î. Badî, M. 'Ebdulah, Dihok: Çapxana Xebat.
- 'Ezîz B. E.& 'Ebdulla M. E. (2018), "Naznaw le Şî'rî Klasîkî Kurdî da" *Govarî Zankoy Silêmanî*, b. XIX/2, j. 54.
- Nurî**, M. M. (2004). *Mersiyyenâme Der Hakk-i İmam Hüseyin*, amd. Zeynelâbidîn Âmidî, Diyarbekir: Diyarbekir Söz Mat., (Ji pêşgotina Zeynelâbidîn Âmidî)
- Okay**, M. O. (2006). "Müstear İsim", *DIA*, b. 32.
- Pertev**, R., (2012). *Mîrsadu'l-Etfal (Şahrahê Kûdekan) Ferhenga Menzûm a Kurdî-Farîsî (Vekolîn-Tekst)*, Mêrdîn: Teza Lîsansa Bilind ya Neçapbûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstituya Zimanê Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.
- Qewmanî**, Ş. M. H. (2011). *Dîwan*, amd. Muhammed Seydaoglu, İstanbul: Nûbihar.
- Qubadî**, X. (2016). *Dîwan*, amd. Karwan Usman Xeyat, Senendec.
- Redhouse**, J. W. (1987). "Mahlas", *Turkish an English Lexicon*, Beirut: Librairie Du Liban.
- Ritter**, H. (2011). *Doğu Mitolojisinin Edebiyatı Etkisi Karşılaştırmalı Edebiyat Metinleri*, edt. Mehmet Kanar, İstanbul: Ayrıntı Yay.
- Sadinî**, M. X. (2010). *Mela Huseynê Bateyî Jiyan Berhem û Helbestêñ Wî*, İstanbul: Nûbihar.
- Se'îd** M. /Xelatî S. (2008). *Evîn û Axîn Dîwan 2*, İstanbul: Hünkar.
- Seleffî** H. A. & Doskî T. Î. (2008). *Mu'cemu's-Şu'erai'l-Kurd*, Duhok: Spîrêz.
- Seydayê Licî**, (1992). "Dîwanu eş-Şeyx Mewlana Muhemed el-Licewî", *Erbeu Menzûmat*, naşır: Zeynelabidîn Amidî, Diyarbekir: Diyarbekir Soz.

- Sonmez, N. (2018) "Mela Ebdullahê Kotaliyê û Helbestên Wî yên Kurmancî" , s. 5, j. 9, r. 97-114.
- Sönmez, N. (2018). *Dîwana Şêx Muşerrefê Xunûkî Metn û Lêkolîn*, Diyarbakır: Seyda Yay.
- Şerîfi, M. (1391). *Ferhengê Edebîyyatê Farisî*, çapa pêncem, Tehran: İntişaratê Mu'în.
- es-Şeyxanî, Ş. M. M. (1387/1968), *Mecme'etun min Erbe'etî Kutub*, bê cih: bê weşanxane.
- Şêx Eskerî (1989), *Iqdê Durfam*, ji tipêن 'Erebî Zeynelabidîn Zinar, Stockholm: weşanêن Apec-tryck & Förlag.
- Şêxê Meczûb, (b.d.). *Dîwan*, amd. Tehsîn Î. Doskî, Dihok: Wezareta Rewşenbîriya Lawan.
- Şoşî, Ş. T. (2012). *Gulzar*, ber. Hemze Tahir Şoşî, Dihok: Îkîtiya Nivîserên Kurd.
- Temo, S. (2007). *Kürt Şiiri Antolojisi* (b. 2), İstanbul: Agora.
- Tendûrekî, (2007). *Dîwan*, amd. Mela Abdurrahman Biçici, İstanbul: Nûbihar.
- Ulugana, S. (2016). *Di Kurdolojiyê de Keşfeke Nû: Xewsi û Dîwana Wî*, Nûbihar, j.137, r. 4-9.
- Uryan, B. T. (2012). *Dubeytî*, ji Lorî: Sabah Kara, İstanbul: Nûbihar.
- Serda, S. G. (2018). *Dîwan Derdê Welat*, İstanbul: Nûbihar.
- Xanî, E. (2009). *Mem û Zîn*, amd. Huseyn Şemrexî, İstanbul: Nûbihar.
-, (b.d.). *Dîwan*, (amd. Tehsîn Î. Doskî), Dihok: Spîrêz.
- Xasî, S. (1985). *Mewlûd*, amd. Zeynelabidin Amidi, Diyarbekir.
- Xeznedar, M. (2002). *Mêjûy Edebî Kurdî*, (b. 1-7), Hewlêr: Dezgay Aras.
- Xudayar, Î. & 'Ubeyd, Y. 'U. S. (1391). "Texellus der Şî'rê Farisî û 'Erebî", *Funûnê Edebî ('Ilmî-Pijûhişî) Danişgahê Isfahan*, 4/1, r. 61-78.
- Yıldırım, A. (2006). *Divan Edebiyatında Mahlas ve Mahlas-nameler*, Ankara: Akçağ.
- Yılmaz, H. (2019), *Dîwana Laxer / Mela Umerê Aşıq (Metin û Lêkolîn)*, Mêrdîn: Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanê Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.
- Zinarexî, M. E. (2018). *Dîwana Mela Ehmedê Zinarexî*, (amd. T. Nas, T. Aydin, A. Adak, Z. Ergün), İstanbul: Nûbihar.
- Zoqî, M. N., (b.t.). *Eqidetu'l-Îmân*, Mustensix: Mela Hemze, Nusxeya taybet a Mela Ebdulcelîlê Mela Hemze.
- Çavkaniyê Destnivîs:
- 'Eskerî, M. (1412). *Keşküle'l-Qellb*, mustensix: Mela Zeynelabidîn Amidî, nusxeya dijital, Diyarbekir: Şarkiyat Araştırmaları Derneği.
- Dînewerî, M. P. (b.t.), *Perîşanname, Staatbibliothek zu Berlin*, Kurd. Ms. orient. Oct. 1152
- Godîşkî, M. N., *Dîwanu Eş'ar we Qesaïd Nûrullah el-Esim el-Godîşkî el-Xeyyûtî summe et-Tatwanî*, nusxeya fotokopî ya destnivîsa dîwanê.
- Hilmî, Ş. E., *Dîwan*, nusxeya fotokopî ya destnivîsa dîwanê.
- Mecmû'e, nusxeya dijital a arşîva A. Jaba li Pirtûkxaneya Giştî ya Lenîngrad/Rûsyayê, j. Kurd 26
- Paresî, I. (b.t.), *Nesîhetu'l-Ixwan*, nusxeya fotokopî ya destnivîsê, pirtûkxaneya taybet a A. Adak.
- Peçarî, F.B. (1956). *Mexmûretu'd-Dewawîn*, nusxeya dijital ji destnivîsa dîwanê ya malbata Peçarî.

Çavkaniyê Dîjîtal:

Se'îd, N. E. (2016). *Şêwazî Si'rî Mela 'Ebdulkérîmî Muderrîs Pertûkî Behar û Gulzar be Nimûme*

<http://www.khaktv.net/all-detail.aspx?jimare=6225>

Çavkaniyê Zarekî:

Mela Imadeddinê Gurdilî
Mela 'Imadeddinê Reşpojan
Mela Me'sûm Dilbirîn
Mehmet Yalar

Extended Abstract:

Pseudonym is a literary name used in the writings of the poets of classical Islamic literature (Arabic Persian, Turkish, and Kurdish). Using pseudonyms is one of fundamental and separative traditions Islamic literature. Be it independent long verses or poems or divans, the standard place of the pseudonym is at the end of the literary works. Though there are miscellaneous names for the place of pseudonym, 'pseudonym place' can be used for all of them.

Pseudonyms had not been used in the ancient Arabic poems. Pseudonyms were used in the Iranian literature for the first time in VIII. century. In Turkish literature, the pseudonyms were used in XV. century. As for Kurdish literature, pseudonyms were first used in Lori Kurdish in XI century and situated in Gorani Kurdish in XV. century. The characteristic of Kurdish pseudonyms is that they were used in the poems of the First Period of Kurdish Literature (Lori Kurdih: XI. Century, Gorani Kurdish: XV. century, Kurmanci Kurdish: XVI. century, Sorani Kurdish: XIX. century, Zazaki Kurdish: XX. Century). The classical Kurdish literature have continued to use the tradition of using pseudonyms to present day

In Kurdish literature as well as in other Islamic literatures the pseudonyms are situated in the end of the poems or in the end of the literary works. However, especially in odes, eulogies and independent works one can see some different ways of using pseudonyms.

Morphologically Kurdish pseudonyms can be classified in two main ways. Pseudonyms that take '-î' suffix (suffix of hometown) and that do not take this suffix. Both forms have multiple ways.

As classical poems are written in aruz prosody there are a natural relationship between pseudonyms and aruz prosody. The poets use pseudonyms in accordan-

ce with long and short syllables of the prosody forms as well as all other words. In terms of prosody forms and Kurdish pseudonyms we reach such an conclusion: Fe'lun (Xanî, Miksî), Fa'ilun (Xelwetî, Bateyî), Fe'ûlun (Sebûrî, Sewadî), Fe'ûl (Mela, Feqî) û Fa'ilatun (Kerbelayî)

Meaning and message of pseudonym are among important sides of it. There is no doubt that the poet aims to give a message to his readers by his own pseudonym. Kurdish poets mostly put forward their names and information on their identity (clan, region, nation, occupation) in their pseudonyms. Besides many messages of pseudonyms are related to psychology of the poets. For instance, the poet occasionally put forward his sorrow, his joy, his love, his mood and his sufistic sides.

As can be seen of Turkish literature poets, many Kurdish poets have derived their pseudonyms from Arabic and Persian words. Some poets chose Kurdish pseudonyms as well in XX. century.

We encounter multi-pseudonyms in Kurdish literature. Multi-pseudonym is that poet has at least two pseudonyms. This can be interpreted in the framework of changing pseudonyms. In another words, these who have more than one pseudonyms, had had a pseudonym at the beginning, then they changed their pseudonym with a new one. However, it is possible that some poets used two or three pseudonyms at the same time.

Common pseudonyms is one of important specialties of Kurdish literature pseudonyms. With common pseudonyms we mean those pseudonyms which were used by two or more poets. Mostly poets used the same pseudonyms at the different time and places unaware of each other. Such pseudonyms are not few in Kurdish literature. Researchers should be aware of this phenomenon in order not to lead any confusion in poets texts.